

'Ev zilm û zora ku li me dikan, dê bibe agir û bi canê wan bikeve'

Xayrî Polat

Rûpel 9



Sal:2 Hejmar: 75 25-31 Tîrmeh 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Di sefera xwe ya Kurdistanê de

Çiller piştgirî da qetlîaman

● Serokwezîra Tirk Tansu Çiller, Alikarê wê Erdal İnönü, 12 wezîrên dewletê û Serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş roja 22'yê Tîrmehê li Kurdistanê derketin seferê. Di seferê de, dîsa wek rayedarên dewletê yên berê, gelek soz, waad û gotinên gelxapandinê serf kirin. Behsa şefqet û qenciyê, çêkirina rê, karistan û dibistanan kirin, bi behsa xurtiya dewletê jî xwestin careke din çavê gel bitirsînin.

● Di vê sefera ku di bin siya generalan de hate kirin de, Serokwezîra nû Tansu Çiller û heyeta xwe, qerargehên leşkerî jî ziyaret kirin. Di dema vê serlêdanê de Tansu Çiller piştgiriya xwe ya ji bo qetlîamên ku li Kurdistanê pêk tînin, pêşkêşî qumandarên leşkerî kir û ji bo pêşerojê jî dilxwaziya xwe ya ji bo berdeyamkirina qetlîaman anî ziman.

Rûpel 8



Serokwezîra nû Tansu Çiller di gerâ xwe ya yekemîn a Kurdistanê de dilxwaziya xwe ya qetlîamkirina gelê Kurd pêşkêşî qumandarê Artêşa Tirk kir.

Banga rewşenbîrên Kurdên li Swêdê

Îro li dinyayê Kurd neteweyeke herî mezin e ku ji mafên xwe yê neteweyî û demokratîk bêpar e. Kurdistan di navbera çar dewletan de hatiye parvekirin. Iraq, Îran, Sûriye û Tirkiye tu mafê Kurdan ên neteweyî, demokratîk û mirovî nas nakin. Kurd bi salan jî bo mafên xwe yê neteweyî û demokratîk têdikoşin.

Piştî Şerê Kendavê Kurdên Başûr mafên xwe yê neteweyî û demokratîk bi dest xistin. Mixabin ku bi vî yekê re dîsa gelek bajar û navçeyên Başûr di bin bandora rejîma Iraqê de mane. Li wan herêman zordestiyeke mezin li ser Kurdan heye. Herêman ku di bin destê dewleta Kurd a Federe de ye, Kurd xwedî azadî û serbestiyekê ne.

Lê di parçeyên welatê me yê din de, bindestbûna Kurdan berdewam e. Bi taybetî li bakurê welatê me barbariya dewleta Tirk her ku diçe dijwar dibe. Dewleta Tirk a kolonyalist hemû hêzên xwe yê leşkerî li Kurdistanê bi cih kirine. Her roj êrişên dijwar dibe ser gelê me. Bêistîna her Kurd hedefa terora dewleta Tirk e. Dewleta Tirk li Kurdistanê şerekî bêqanûn û bènorm didomîne. Li gor ra-

porên rêxistinên mafên mirovan îsal dewletê 500 gundê Kurdan wêran kirine û şewitandine. Di salekê de 16 rojnamevan hatin kuştin. Ji wan yek jî Musa Anterê 73 salî bû. Bi tenê di meha Hezîranê de 87 kesên sîvil hatin kuştin. Di salekê de hejmara kuştîyan jî 4 hezar kesî derbas kir. Di nav sê rojan (30.6./3.7.1993) de 120 kes hatin kuştin.

Berpirsiyarê vî şerê qirêj bi tenê hikûmeta Tirk e. Kurd ne alîgirê şer in. Wek tê zanîn PKK'ê di 20'ê meha Adarê de, bi yekalî şer rawestand. Hêzên Kurdan ên din jî piştigirîya şerrawestîna kirin. Hemû hêzên Kurdan daxwazên xwe yê hevbeş jî raya giştî ya cihanê re diyar kirin. Partî, rêxistin û gelê Kurd 33 roj li benda bersiva Tirkiyê man. Hezar mixabin dewleta Tirk di vî dema şerrawestîna de operasyonên xwe yê leşkerî bi dijwarî domand. Di vî dema şerrawestîna de 101 gefîla û 39 kesên sîvil jî aliyê hêzên dewletê ve hatin şehîdkirin. 27 kes birîndar bûn. 44 gund hatin şewitandin. Dewletê bi van kirinên xwe şertê aştiyê jî navê rakir. Politîka xwe ya 70 salan bi dijwarî domand. Her

wiha gelê Kurd û Tirk careke din çareserkirina pirsê bi awayekî aştiwaz jî dest revandin.

Îro hemû hêzên Bakur jî bo xebata damezirandina eniyeye neteweyî xebat dikin. Hemû hêzên Kurd hemfikir in ku pîrsa Kurd bi riya politik çareser bibe. Ji ber vî yekê jî, ew jî diyalogan re amade ne. Yekîtiya hêzên Kurd û daxwazên wan ên ku pîrsa Kurd bi rê û metodên politik bê çareserkirin me dilxweş û kêfxweş dike. Divê dewleta Tirk dev ji politîka xwe ya 70 salan a înkâr û îmhakirina Kurdan berde.

Em wekî ronakbîrên Kurd jî hemû parlamenter, partî, rêxistinên politik, humanîst, kulturî, pîşeyî, çapemenî û hwd. ên Swêdê daxwaz dikin ku ji bo çareserkirina pîrsa Kurd bi rê û metodên aştiwaz hewla çareserkirinê bidin. Însiyatîf bigirin. Li hember politîka dewleta Tirk a militarîst rawestin. Ji bo çareserkirina pîrsa Kurd bi awayekî wekhevî û rasî em banga we ya piştigiriyê dikin!

Abbas Kerîm (doktorê diranan), Alî Çiftçi (weşanvan), Anwar Shabo (muhendîs), Ahmed Hussaynî (helbestvan), Ahmet

Guleken (mamoste), Amed Tigrîs (nivîskar), Aso Germiyani (mamoste), Azad Cigerxwîn (hiqûqnas), Baroj Akreyî (nivîskar), Bahar Alî (mamoste), Çetin Çeko (rojnamevan), Eşref Okumuş (rojnamevan), Firad Cewerî (nivîskar), Hasan Zana (wergêr), Hasan Qazî (wergêr), J. Espar (wergêr), Xebat Arîf (nivîskar), Kemal Gurgu (artîst), Karwan Saîd (fizîker), Xalid Reşîd (muzisyen), Lokman Karzan (rejîsor), Malmisanîj (nivîskar), Mahmud Lewendî (nivîskar), Mahfûz Mayî (helbestvan), Mohamed Farej (mamoste), Mohamed Hachem (ekonom), M. Alî Tüysüz (mamoste), Mîrhem Yîgît (mamoste), Mehmed Soner (jeolog), Nacî Kutlay (doktor), Nasir Razazî (hunermend), Nazîf Ahmed (mamoste), Rohat (nivîskar), Reşo Zilan (mamoste), Sebo (stajer doktor), Sabah Saced (muhendîs), Bawer Pîroz (ekonom), Saleh Îsmail (muhendîsê kişt û kal), Sedat Anter (teknîker), Sabe Hawayalî (muhendîs), Şerefxan Cizîrî (politîkvanê herêmî), Weysî Zeydanlioğlu (hiqûqnas), Wehab Serî (nûçegihan), Wesfî Mayî (mamoste), Zagros Zerdestî (mamoste).

FERHENGOK

- Çarek: Çarîn (dörtlük)
- Ferisandin: Verisandin, vezinandin (çözmek)
- Ferisîn: Verisîn, vezinîn (çözölmek)
- Hilşandin: Hilweşandin, herifandin
- Hilşîn: Hilweşîn, herifîn
- Hincirandin: Gelpîçandin, pelçiqandina pot û pertal
- Jiy: Jîn, jîyan
- Melisandin: Qutifandin, çavtirsandin (sindirmek)
- Melisîn: Qutifîn, çavtirsîn (sinmek)
- Pawan: Nobet
- Pawantî: Nobedarî
- Pawankar: Nobetdar
- Qewar: Nasir, qusandina çermê dest û piyan
- Qewardan: Nasirbûn
- Qewartin: Nava tiştêkî derxistin (oymak)
- Raspartin: Teslîmkirin, emanetkîrîn
- Rist: Rol
- Sikûm: Rû, rûçik, rûyê madekirî (somurtkan yüz)
- Tengezar: Derbeder, ê ku ji welat dûr e
- Têgih: Wate, mane
- Têgîn: Term, mefhûm (kavram)
- Toqîn: Tirsê erjeng (dehşet)
- Toqandin: Tirsê çêkirin, tirsandin, bizdandin (dehşet salmak)
- Zelût: Serût (dazlak), tazî (çiplak)
- Zêrin: Jêxwarin, lêmijîn, kedxwarî (sömürü)
- Zêrandin: Jêxwarin, kedxwariyê kirin (sömürmek)
- Zilitîn: Zelitîn, çerixîn, çelîtandin (derinin hafif soyulması)

Dê bêne çirandin rûpelên dîrokê yê qirêj

Ji bo Peymana Lausanne (Lozan)ê pîr tişt hatiye gotin û nivîsandin. Wê hê jî bê nivîsandin û gotin. Lewre emê bi awayeke din li vî bûyerê binêrin.

Kurdistan! Ji bo te çî bê gotin, bê kirin hindik e... Tu pîr delal î, xweşik î... Tu dewlemend î, buhişt î tu! (Lê belê ev buhiştîya te ji te re bûye kul, keser û birîn. Bûye zor, zordarî û şewat)

Gelê Kurd di jiyana xwe de, rojek tenê bi hêsanî derbas nekirine. Her dem hirç û hovan êriş, talan û qirkirin li ser meşandine. Û ji bo bigihîn armanca xwe ya qirêj û gemar jî Kurdistan li hev par kirine...

Parkirina welatê Kurdan du caran hatiye kirin. Ya yekemîn: Di navbera Împaratoriya Osmanî û Îraniya de pêk hatiye. Sal: 1639. Cih: Qesra Şîrîn (Navê te şîrîn e, lê kirina te na!) A duyemîn jî (Eva ango li ser emê şîrove bikin) Peymana Lausanne ye. Bi vî peymanê jî Kurdistan di navbera Komara Tirkiyê, Sûrî, Iraq û Îranê de hatiye çar parçekirin û bûye tarûmar...

Peymana Lausanne di sala 1923'an, 23-24'ê meha Tirmehê li Fransa, bajarê Lausanne (Peyman navê xwe jî bajarê lê hatî çêkirin dîstîne) hatiye girêdan.

Gelê Kurd tu demê parkirina xaka xwe (a bi destê dijman hatî kirin) bi dilxweşî neparastine. Na! Tim û tim jî bo yekîtiya welatê xwe têkoşinên dijwar dane meşandin. Lê çî şewat e ku,

jiyanê dest nedaye wan!..

Ji destpêka Peymana Qesra Şîrîn heta îro, axa Kurdistan û gelê Kurd rojek bêser, serhildan û têkoşîn derbas nekiriye. Mirovê Kurd bi zêdeyî di sedsalan bîstî de berxwedanên xwe daye ajotin. Her berxwedanên gelêrî û neteweyî li dû xwe, biçûk be jî serkeftinê hiştine. Wek serkeftina; êş, kul, xwîn, mirin û şewatên mezin jî li dû xwe berdane. Ew di dilê gelê Kurd de bûne, çavkaniya tolhildana mezin, meşa azadiya dirêj û serxwebûnxwaziyek dilsozî! Do gelê Kurd wiha dipirsi: "Wê, kur re here-ev gurra-gurra di dilê min de kom bûye!" Îro jî bersiva vî pirsê bi devê xwe ew dide, dijmin û hogiran...

Ji sala 1923'yan ta îro, gelê Kurd jî bo axa xwe, mîna berê bike yek, li bakur-başûr, li rojhilat û rojava şer daye, şer dide. Koçgîrî, Şêx Seîd, Sason, Zilan, Agirî, Mehabad, Berzan û hwd. Daxwaz û armanca gelê Kurd, biryara jiyana xwe di destê xwe bixwe ye! Gelê Kurd bi dengêkî bilind bang dike: "Ezê bi destê xwe binivîsim hatina xwe." Bi rastî, ev daxwaz îro pîr nêzik e. Bi saya şerê 15 Tebaxa 1984'an! Dîrok wê jî rû ve were nivîsandin. Qesra Şîrîn û Lozan jî şerma wê serê xwe berjêr bikin. Peymanên wan wê bèn qetandin- çirandin, bi destên mirovên Kurd!

Wê dîrok wiha binivîse: Demekê peymanên Qesra Şîrîn û

Lozanê hebûn. Û bêmaf xaka gelê Kurd, ji dagirker û biyanîyan re par kiribûn...

Wê dîrok wiha jî binivîsîne: Gelê Kurd bi pêşketina tevgera azadiyê meşiya û mafê xwe stand. Îro azad, serbilind, serfiraz, bi biratî, mirovhayî, aşti û bi dilsozî didomîne.

Wê bêne şewitandin ev rûpelên rêş, yê li Qesra Şîrîn û Lozanê hatine nivîsandin. Rûpelên paqij û spî jî gelê Kurd re ji îro ve tene amadekirin. Xwendina wan pelan ne dîr e! Wê çiqas pîroz bin yê wan rûpelan bixwînin!

Qirînkar

SERXWEŞÎ

Mirina bavê dostê me yê hêja, diplomat, Serokê YNK'ê Mam Celal Telabanî,

Şêx Hisamedîn Telabanî

em pîr eşandin û xembar kirin.

Li ser navê partiya me û grûba me ya meclîsê ji rehmetî re duadarê rehma Xwedê me. Serê Mam Celal Telabanî û malbata wî sax bin.



Yaşar Kaya
Serokê Giştî yê Partiya Demokrasiyê

Nûçeyên cengê

● *Piştî biryara dewletê ya "bi her awayî şer" zordestiya li ser valakirina gundan zêde bû. Roj bi roj hejmara gundên valabûyî bêhtir dibin. Gel bi darê zorê ji alî hêzên dewletê yên leşkerî ku di şerê bi gerîla re dikevin tengasiyê ve tîn koçberkirin. Ji aliyê din ve teror û qirkirina dewletê ya li ser gelê sivil didome. Wek mînak Gîhadînê; dewlet bi tîmên taybetî diavêje ser malan û qirkirinan pêk tîne, şûn ve di çapemeniyê de ev kirin weke ku ji aliyê PKK'ê ve çêbûbin derpêşî raya giştî dibê. Ev sêşema çûyî jî li Wanê bûyerek bi vî rengî qewimî. Tîmên taybetî diavêjin ser Zozana 'Sündüz' 15 jê zarok 8 jin, tevîhev 23 kesî dikujin.*

Navenda Nûçeyan- 16 Tirmeh 1993: Ji Mêrdînê û Sêrtê 3 gund bi zordarî hatin valakirin. Hêzên dewletê 4 mal ji gundê Zêwîkê ku li ser navçeya Kerboranê (Dargeçît) ye şewitandin, tevî xwediyê malekê 8 kes ji gund girtin bin çav. Gundê Girdara ku li ser navçeya Dihê (Eruh) ya Sêrtê ye bi nîfûsa xwe ya 1000 kesî vala bû. Gundên Sêrtê yên bi navê Gundêkêşê û 'Yanılmaz' jî, ji ber zordestiya ku li wan tê kirin vala bûn. Hêzên dewletê ji bo ev herdu gund cerdevantiyê bikin li wan tahde kir lê gundî ev pêşniyar qebûl nekirin. Li ser vî awayî ji her malê hêzên dewletê mezelekê (odeyekê) veqetandin û cerdevanekî ku ji derî gund anîbûn li wir bi cih kirin.

Ji Dihê (Eruh) gundên, Memiran, 'Findikli', 'Şehvelî', Herarêsk û Nivîla; ji Hezo jî Xerbelûk vala bûn.

Gerîla di nav Batmanê û Diyarbakir de piştî ku rêwiyên trêne jê peya kirin ew bi roketê texrîb kirin û şewitandin.

Li Îdirê cerdevanê bi navê Gulî Aydemîr hate kuştin û tevî pere di devê wî de bi dar ve hate daleqandin.

17 Tirmeh 1993: Ev heye heftiyek operasyonên ku li hêla Nurhak û Elbîstana Mereşê dest pê kiribûn, bi valakirina gundên 'Bakiş', 'Soğucak', 'Ağcasar', 'Zillihan', 'Hançiplak', 'Hatkiran', 'Kale' û 'Kosekahya' domiya. Bi operasyonên bombebaranê herêma 'Deveboyu' ya daristan tev de şewitî.

Li navçeya 'Pazarcik' ya Mereşê hêzên dewletê bi hevkarîya cerdevanan terorê li ser gel pêk anîn. Ev herdu hêz jî gundê 'Hörükobasi' 6 şivanan xistin û işkence li wan kirin ji bo ku cihên gerîla ji wan re bê gotin.

18 Tirmeh 1993: Gerîla qereqola gundê Avrek ku li ser navçeya Darahênê (Geç) ya Çepêçûrê (Bingolê) ye û berî demê hatibû valakirin, şewitandin. Gerîla Pira Aman ku li Nisêbinê ye ji ber sewkiyata navgînên leşkerî ku di ser re dibû bi hewa xistin. Li Bazîdê jî du erebeyên resmî piştî karkerên wê hatin şewitandin. Li Qubîne (Bişeriyê) du dibistan hatin şewitandin û diyarkirin ku livbaziyan wan ên bi vî rengî wê bidomin.

19 Tirmeh 1993: Tîmên taybetî li Wanê qirkirin pêk anîn. Komek tîmên çekdar diavêjin ser Zozana Sündüzê ku li ser navçeya Miksê (Bahçesaray) Wanê ye

15 zarok 8 jî jin, 23 kesî dikujin. Ajansa Anadolu ev bûyer weke ku ji aliyê PKK'ê ve hatibe kirin bi nav kir. Lê Berdevkê Eyaleta Serhedê ye PKK'ê nerastiya ve bûyerê diyar kir got "Em çî livbaziyan bikin em digirin ser xwe." Ev raste rast provokasyona dewletê ye.

Li hêla Mutkiya Bilîsê gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê li hev xistin, li gor KURD-HA 4 gerîla, 8 leşker û 6 cerdevan hatin kuştin. Gerîla li Bingolê avêtin ser qereqola navçeya 'Yayladere' û ew xesirandin. Li gor nûçeyên herêmî di vî êrîşê de 6 leşker mirin 9 birîndar bûn. Di êrîşa gerîla ya li ser navçeya 'Taşlıçay' a Agirî de avahiyan dewletê xesirîn. Girtîgeha Agirî jî, ji êrîşa bi roketavêjan xesir girt.

Di êrîşa gerîla ya bi ser gundê Gêracahfer ku li ser Kerboranê ya Mêrdînê ye de 7 cerdevan hatin kuştin. Gerîla çekên cerdevanan ji wan stand.

Di nav vî mehê de ji Agirî bêhtir 200 cerdevanî îstifa kirin. Ev cerdevanên ku îstifa kirin ji gundên Korxan, Taşkin, Babya û Çakirbey ku li ser navçeya Patnosê ne, ne.

Dewletê ji bo bibin cerdevan zordestiya li gundiyên gundê ku li ser navçeya Şemrêxê (Mazidağî) ya Mêrdînê ne kir lê gundî ev daxwaza wan qebûl nekirin. Li ser vî awayî bi darê zorê gundên Yalinağaç, Melebiyê, İdrîsa, Yewrê û Simoqiye hatin valakirin. Eynî roj hêzên dewletê sê gundên Sêrtê, Miwêlê, Şemsê û Guhêrê şewitandin û gelek kesên ji wan gundan xistin bin çav.

20 Tirmeh 1993: Li Bilîsê şerê di nav gerîla û hêzên dewletê de xurt bû, bi vî awayî dewlet gelek gund bombebaran kir. Operasyon pirrtirîn li hêla gundên Şêxcuman, Lerd; Qesrik, Yaqu, Xaçukan, Hersok, Hevînis, Papiznex, Kenexder û Şanaduxan pêk tîn.

Stasyona trêne ya di navbera Bismil û Amedê de ji alî gerîla ve hate şewitandin.

21 Tirmeh 1993: Tîmên taybetî li Hezroyê dikan şewitandin. Li Hezro navçeya Amedê tîmên taybetî bi hevkarîya cerdevanan dikanên esnafên ku berî demê kepengên xwe radabûn şewitandin. Şûn ve cûnûhatina navçeyê hat qedexekirin. Li gundê Kevrêqul ku li ser Bilîsê ye bi mebesta ku alîkariya PKK'ê tê kirin tevî melê gund 7

kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin.

Gerîla avêt ser qereqola Milakêrî ku li ser Şirnexê ye, leşker mir du leşker birîndar bûn. Milakêrî gundekî ku cerdevan û leşker jî lê dimînin e.

Qereqolên ku berî mehekê gerîla avêtibû ser wan hatin valakirin. Qereqolên 'Çelik', (Temel) û (Bostanci) li ser navçeya Kerborana (Dargeçît) Mêrdînê ne. Wekî din jê vî navçeyê gundên Şikeftka, Mişte, Gremere û Drecî bi zor hatin valakirin. Niştecihên van gundan koçî Sêrtê bûn.

Konwoya leşkerî li hêla navçeya Pûlûr (Ovacik) ku li ser Dêrsimê ye ket kemîna gerîlayên ARGK'ê 7 leşker mirin, 10 jî birîndar bûn.

Dewlet sewqiyateke leşkerî ya xurt li dorhêla çiyayên Maba ya Sêrtê dike. Li gor nûçeyên herêmî, dor li gundên Behere, Şemse û Miwele hatiye girtin.

Timekî taybetî bi navê Yusuf Tanriverdî hat kuştin, Şefîk Tanriverdî jî birîndar bû. Nûneriya ERNK'ê ya Cizîrê ev êrîş girt ser xwe.

8 cerdevanên ji êla Mamxuran ku li Beytüşebaba Şirnexê ne ji aliyê gerîla ve hatin revandin. Ji gundên Zorava û Herdova ku li ser navçeya Bazîdê ya Agirî ne 21 cerdevan îstifa kirin.

Li Duhokê avahiya MÎT'ê hate bombekirin û zirarekî zêde girt.

22 Tirmeh 1993: Leşker û cerdevanên Midyadê avêtin ser gundê Hermesê, du mal tevî eşyayên wan şewitandin, gelek jî heywan telef bûn. Leşkerên Kerboranê ev bûyer bi alîkariya cerdevan Felemez Aslan (Felemezê Cimo) û zilamên wî pêk anîn.

Hêzên dewletê bi geşbûna êrîşên gerîla re, li Serhedê jî berê xwe dan gundan. Bi vî awayî avêtin ser gundê bi navê Nureşin ku li ser Bazîda Agirî ye, malan şewitandin, cûnûhatina gund qedexe kirin.

Li navçeya Gîhadîn ya Agirî di şerê gerîla û dewletê de 2 gerîla mirin. Gerîla dibistana Kanîqulê ku li ser avbîna Batmanê ye şewitandin.

Gerîlayên ARGK'ê li ser pira Nêrdûş ku di navbera Cizîrê û Silopî de ye, panzerêkê şewitandin. Şûn ve dewlet gundên der û dor bombebaran kirin.

Du gerîla dema xwestin êrîş bibin ser stasyona radarê ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kuştin li Gîhadîna Agirî.

HAWAR

Dilbixwîn

55 Dolar li 'Soro' çûn

Berî vî bi çend rojan ez li mala welatparêzekî bûme mewan. Nêzikî 40 jin, mêr û zarok rûniştibûn û li filmê Soro temaşe dikirin. Deng ji wan dernediket, baş bala xwe dabûne bûyer û leyistikvanan. Hinek digiriyar, hinek jî dikeniyar, çavên wan ji ken û girîne sor bûbûn.

Dema ku serleyistikvanê filmê Soro (rola milîsekî welatparêz dileyîze) hate kuştin, min hew dît ji nişka ve deng bi pîrejineke temaşevan ket, kelegirî bû, hêstirên xwe pak dikirin û got: "Mala diya te bişewite Soro. Vemirîne keçê vemirîne, bila çavên min nebînin. Van bêbavên Tirkan kezeba min şewitandin..."

Piştî qedandina film, me gelekî dirêj li ser vegera welat û xwedîderketina li wê axa şîrîn deng kir.

Her kesî behsa Soro dikir, zarokan jî digotin ji me re Soro bidin ser.

Di civîneke xwe de (Koma Cûdî) me got em filmekî bikişînin. Ev gotin bû sebebê kenekê ji hêla her kesî ve, "Em li ku derê, kişandina filmekî li ku derê." Em hîna nikarin li gora diyalogê xwe bilivînin. Hevala Xanê got: "Ez bi xwe li pêşiya kamerayê nasekinim. Eger bavo min di film de bibîne, wê min daleqîne..."

Dema ku serleyistikvanê filmê Soro (rola milîsekî welatparêz dileyîze) hate kuştin, min hew dît ji nişka ve deng bi pîrejineke temaşevan ket, kelegirî bû, hêstirên xwe pak dikirin û got: "Mala diya te bişewite Soro. Vemirîne keçê vemirîne, bila çavên min nebînin. Van bêbavên Tirkan kezeba min şewitandin..."

Hevalê Hesoyê destê xwe hilda, destûr xwest û got: "Di nava me de cihê tirsonekan tune ye. Ji koma me hevalên şoreşger derketine, divê layîqî wan bin..."

Û me bi hev re piştî biryara hevalan, biryara kişandina film da.

Ez û Şerwan (Soro) em çûne cem rejîsorekî ji bo ku rê nişanî me bide. Ew Kurd bû, le Ereban ew di nava xwe de asîmîle kiribûn. Heya serê sibehê me sohbet kir. Me dixwest em di film de Soro bikujin. Me jê pirsî: "Wê çawa xwîn xwe ji canê Soro biavêje?" Wîha bersiva me da: "Eger hûn bixwazin temaşevan bi teknîka xwînavetîne nehise, divê hûn bi hezaran mesref bikin!" Û ji me re plan danî. Lê emê wan hezaran ji ku binîn?! Min û Soro me di bin çavan re li hev nihêrî. Bila li we ecêb neyê, me mesele bi mirîşkekê ha kir.

Teknîka makyajkirinê li cem me tune bû. Ne derman, ne jî çelengkirin. Li pêşiya kamerayê her tişt xwezayî bû.

Proyayê hêrî dî çihên tarî û bêdeng de bûn. Ji bo ku kesek bi me nehise, me bi dizî hereket dikir: "Aman dengê xwe nizim bike, cîranan bi me nehîsîne, bi dizî here, bi dizî were... Senaryo bi xwe re negerîne..." Bi vî awayî prova çêdibûn.

Sal dawîya 89'an e. Em li gund in. Serê beyanê me dest bi kişandinê kir. Her kes amade bû, keçikan xwe xemilandibûn, zarokan sîngên xwe vekiribûn, jinan şîrmijên xwe hilgirtibûn û li benda me bûn. Gelekî kêfxweş bûn, jî lêvên wan ken difiriyar, wê têkevin film, bûyereke ciwan(xweş) bû...

Kameraya me, ne ya sînemayê bû, xwediyê wê jî bo dawetan kiribû. Hîna nizanibû bi kar bîniya, cara yekemîn bû ku dixist e destê xwe, buhayê wê û saetekê destan weke hev bû, modeleke kevin bû. Erebeya ku di filmê de xuya dike, ya welatparêzekî bû. Di rojên kişandinê de xwediyê wê çûbû Helebê, kurê wî Mihemed bi dizî otomobîl ji me re anîbû, pişt re em pê hesiyar.

Di nava me de hevalê Sebrî jî hebû. Pişt re şehîd ket. Her şev ji gundiyan re semîner dihatin dayîn. Pênc rojên xweş, şîrîn û bi xwezî. Tu caran jî bîr nabin.

Weke ku doh çêbûbe. Li pêşiya çavên min gundî yeko-yeko xwe nişan didin.

Ji wan hevalan, şoreşê em her yek bi aliyekî ve birin. Her yek bi karekî rakirin. Bîranînên wan deman, wan rojên bi gundiyan fedekar re ji her gavê nemirtir in.

Û li dawiyê mesrefa Soro 55 Dolar bûn.

Jana rêzaniya Hizba Şûî û veqetandina riyên başûr

Seyîd Çiya

Partiya Komunîst a Iraqê (PK-I), li Iraq û li Kurdistana Başûr bi navê "Hizba Şûî" tê naskirin. PK-I an jî Hizba Şûî heta çend sal berê, li hemû Rojhilatê, di nav partiyên komunîst de pîr girîng bû.

PK-I, di sala 1930'an de bi navê Hizbul Taharur ul Îstiklal (Partiya Serxwebûn û Rizgariyê) ket nav jiyana rêzaniya Iraq û Rojhilatê.

Navê xwe yê niha (Partiya Komunîst a Iraqê) roja 31'ê Adarê di sala 1934'an de stand û li Bexdayê dest bi jiyandê kir.

Komunîst dema ketin nav şer, axa Iraqê hemû li bin gîzmeya Îngilîz de dipelçiqî. Tenê li Kurdistanê Şêx Mehmedê Berzencî şûrê azadiyê kişandibû. Û li hember artêşa lejyonerê Îngilîz sekinîbû.

Sazûmankarê PK-I'yê Yûsif Selman Yûsif bû. Yûsif di nav gel de bi navê Fehd (Şêr) dihat naskirin. Rewşenbîrê Asûrî bû. PK-I, çend salê pêşî, pîrranî di nav rewşenbîr û bajarên de bi dizî xebat meşand. Fehd di sala 1949'an de ket destê rejîma Nûrî Seîd.

Di vê wextê, de giraniya komunîstan li her aliyê zêde bû. Artêşa Sor li hember Naziyan serketibû. Bi serokatiya Stalîn, Yekîtiya Sovyetê dinyayê ji bela faşîzmê rizgar kiribû. Hizba Şûî jî, ji vê tesîrê ava bûbû. Û alîkarê Sovyet û jî Stalîn bû. Îngilîz di şerê mezin de piştgiriyê Sovyetê bû. Lê belê di bin de jî neyar bû ji bo Sovyetê. Komunîzm jî Nazîzmê xerabtir didît û di bin hikmê xwe de çav li komunîsta venedikir. Û Iraq di bin destê wî de, Fehd jî di zîndana Iraqê de bû. Îngilîz bi vê neyartiyê Fehd û hevalê wî yê Qomîteya Merkezi



Hazim û Sarim li Bexdayê bi dar ve kir. Ev bûyer ji bo dîroka Şûiya bû xelesa yekemîn di zincîra windabûnê de.

Piştî Fehd, Hemîd Osman hat serokatiya partiyê. Xebata bi dizî roj bi roj partiyê ber bi xurtbûnê ve dibir.

Di sala 1953'an de PK-I Kongreyê fevkalade civand. Di vê kongreyê de Selam Adil ku Erebbû, ket cihê Hemîd Osman.

Dîktatoriya malbata Haşimîyan, di sala 1958'an de hat qelbandin. Artêşa Iraqê, bi serokatiya Ebdulkerîm Kasim dest danî ser îktidarê. Derbeya leşkerî li Iraqê rewşek demokratîk çêkir. PK-I tevî PDK-I û hemû tevgerê veşarî, dest bi xebata aşîkar kirin.

HIZBA ŞEHÎDAN

Hizba Şûî, di sala 1959'an de, li hember serhildana "Hereket el Şewaf" bi Kasim re piştgirî kir. Kasim bi destê Şûiyên li Mûsilê qetlîameke mezin kir. Hêzên Şûî li şomendîferan aşiyê şîwar dibûn û diçûn Mûsilê. Bi fitê Kasim li bajêr qetlîameke mezin kirin.

Di sala 1958'an de Mele Mîstefa û penaberên Sovyetê vegeyan welat. Rewşa serbestî heta 1963'an dom kir. Şûî, di vê demê de dinav bajarî û gundiyan de alîgiriyê xurt civandibû. Bi vê xurtiyê ev sal beşdarî koalîsyonê bû û Wezareta Aboriyê bi dest xist.

Di sala 1987'an de kongreya 12.a Partiya Komunîstê Yewnan civiyan. Partiya Komunîstê Tirkîye, Îran (Tudeh), Iraq û Sûriyê jî dawetkerî Atînayê bûn. Serok û berdevkê hemû partiyê komunîst di kongreyê de xeber dan û li ser girîngiya şerê neteweyî yê dinê sekinîn. Lê belê, pîrsa Kurd nehat bîra wan, Kurd li dinyaya wan nedîjn.

28'ê Sibate, bû rojek tarî di dîroka Hizba Şûî de. Sala nû, di meha du, Şûî dîsa xwe hilkişandin bin axê. Partî bi destê dîktatorê nû A.Selam Arîf û Ahmet Hesen el Bekr hatibû girtin. Zilma reş dîsa dest pê kiribû. Rejîm, Şûiyê ku digirt wek heywanan li şomendîferan siwardikir û berê wan dida Bexdayê. Bi sedan Şûî di şomendîferan de, ji tîna û jî birçîna mirin. Qasî wan jî hatin gullebarankirin an jî xeniqandin. Komunîstê ku filitîn, xwe avêtin çiyayê Kurdistanê. Navê Hizba Şûî bi qirkirina 1963'an, di nav gel de, bi şêklê Hizba Şehîdan hat guhertin. Piştî vê demê PK-I'yê, li çiyayê Kurdistana rizgarkirî, li gel pêşmergeyê Kurd dest bi şer kir. Li dîl a Adil ve jî, Cemal Heyderî bû serokê partiyê. Heyderî jî wek Hemîd Osman Kurdê Hewlerê bû. Bes, jiyana serokatiya Heyderî jî kurt bû. Ew sal ket faqa Baas û tevî hevalê xwe Nafî Yunus hat daleqandin. Piştî Heyderî di sala 1964'an de dîsa Kurdek Hewlerî, Azîz Muhamed bû Sekreterê Giştîyê PK-I'yê. Şûî, li gel pêşmerge di çiya de li dijî Baasiyan şer dom dikir. Hinek milê partiyê jî, li bajarên xebata veşarî diajot.

PK-I yê, di sala 1964'an de li nêzî Rewandûzê li çiyayê Hindêrên li dijî artêşa Iraqê şerêkî dengdayî kir. Di vî şerî de Şûiyên qehremaniyê mezin kir û

bi vî şerî li Kurdistanê hat naskirin.

HIZBA ŞÛÎ: DI ROJHILATÊ DE ŞÛRÊ SOVYETÊ

Partî bi serokatiya Azîz Muhamed, car caran rastî pîrsgirêkên girîng hat. Di sala 1967'an de Kurdê Maoîst Azîz ul Hac tevî alîkarê xwe jî serokatiya Muhamed veqetiya. Muhammed, xeta keyneşopî diajot û bi îdeolojiyêkî girêdayî Sovyetê bû. Di vê veqetandinê de pîrê endamê partiyê li gel Hac çûbû. Rejîma Sovyetê jî aliyêkî ve palpiştî dida rejîmê, ji aliyêkî piştî Şûî û Kurdan miz dida.

Şûiyên di dîroka xwe de xeletêkî din jî kir û di sala 1973'an de bi telkîna Sovyetê jî, li dijî Kurdan bi Baasiyan piştgirî re danî. Êdî tevgera Kurd jî bo Şûiya, "Xulamtiya împeryalizmê û pev-xebatkariya CIA û MOSSAD" ê bû.

Ev sal di nav PKI, Baas û PDK-I'yê de şerê rojnameyan derket. Şûiyên bi rojnama xwe ya "Tarîk el Şaab/ Riyaya Gel", Baasiyan jî bi "El Tavra/ Şores" êrîşî PDK-I'ê dikir. PDK-I'ê jî di rojnama xwe ya "El Teaxi/ Brayetî" de bersiv dida. Ev şerê rojnameyan heya roja 11'ê Adarê 1974'an ajot. Û piştî vî rojname cihê xwe jî tîfingên re hişt.

PK-I'yê, li gel Baas, bi pêşmergeyê Kurd re şer dikir.

Piştî peymanê Cezayîrê di 1974'an de serokatiya Kurd reviya an jî radest bû. Di vê îttifaqê de Baasiyan 2 wezaret dabû PK-I'yê. Yek jî Wezîrê Kîştûkal (Çandinî) Dr. Mukerrem Talabani bû.

PK-I'yê, heta sala 1979'an, dijîminatiya tevgera Kurdî û alîkariya Baasê domand. Lê belê dîrok ewê xwe dîsa dubare bikira. Dostaniya PK-I û Baasê ev sal qediya.

RIYA KOMUNÎSTÊ KURD JI PK-I'YÊ VEDIQETE

Li sala 1984'an di nav partiyê de dijîti bilind bûbû. Muhamed, alîkarên xwe roj bi roj wînda dikirin. Di sala 1985'an de Kongreya 4. civiya. Muhamed dijiyên xwe nexist kongreyê. Sovyetê li vê kongreyê alîkarî bi Muhamed re kir. Berî kongreyê, sala 1984'an Nişana Lenîn da Muhamed. Muhamed, di sala 1974'an de jî, Xelata Dewleta Sovyetê girtibû.

PK-I di sala 1980'yî, meha Kanûnê de ket Berya CUD. Di Berya Niştimaniya Demokrasiya Iraqî de PASOK, PSK-I, PDK-I, Koma Demokratê Iraqê, Partiya Sosyalîst a Iraqê û PK-I hebû.

Di 1982'an de jî 19 partiyên Iraqê û Kurdistanê li Libyayê Beryyê CUQD ava kir. Lê ev bere neçû serî. Ev rewş heta sala 1988'an dom kir. Vê salê PK-I daxilê Beryyê Kurdistanê bû û dawî da şerê birakujiyê.

Di sala 1987'an de kongreya 12.a Partiya Komunîstê Yewnan civiyan. Partiya Komunîstê Tirkîye, Îran (Tudeh), Iraq û Sûriyê jî dawetkerî Atînayê bûn. Serok û berdevkê hemû partiyê komunîst di kongreyê de xeber dan û li ser girîngiya şerê neteweyî yê dinê sekinîn. Lê belê, pîrsa Kurd nehat bîra wan, Kurd li dinyaya wan nedîjn.

Êrîşa Îranê li ser başûrê Kurdistanê

Nûçeyên Derve- Li gor çavkaniyêkî ji Hewlêrê paytexta Kurdistana Başûr, mîsyonerekî resmî yê hikûmeta Îranê, di 17'ê Tirmeha 1993'yan de ji Kurdistana Başûr vegeya Îranê. Tê xuyan ku di nav wan û hikûmeta Başûr de tu îttifaq çênebû, li gor hêzên siyasî yên Kurdên Îran ku niha li Kurdistana Başûr dimînin. Li gor vî çavkaniyê hikûmeta Başûr ev daxwaza Îran nepejirand. Daxwaz ew bû ku, sînorek ji bo çalakîyên hêzên opozîsyonên Kurdistana Rojhilatê bê danîn. Li gor diyarkirina çavkaniyê Hikûmeta Başûr nexwest bikeve bin fermanên tu kesî. Rayedar; "Em bi xwe biryara mayîna van hêzan di nav axa xwede didin an nadin. Niha niyeta me ji bo koçkirina wan nîn e, tenê me ji wan xwestiye ku, ji axa me êrîşê nebin ser Îranê" got. Ev herdu hêzên Îranî ku li Kurdistana Başûr dimînin, KDP-Îran û Partiya Komunîst in.

Tê gotin ku, hikûmeta Îranê, berî demê ev daxwaz ji Partiya

Karkerên Kurdistanê jî kiribû, lê belê PKK ev yek qebûl nekiribû û jî ber vî 'awâyî' bargehên wê jî aliyê Îranê ve hatibûn bombekirin.

Piştî vê di 18'ê Tirmehê de dewleta Îranê Kurdistana Başûr bombebaran kir. Li gor çavkaniyên Kurd û rêxistinên mirovperwer yên navneteweyî, di vê bombebaranê de 7 kes hatin kuştin, li deverên ser sînor.

Her wiha 23 gundên li hêla Keladîzê valabûn û niştecihên wê ku 7000 in, koçberbûn: Ji aliyê din ve li gor daxuyaniya serokê leşkerî yê Kurdistana Başûr li seriya 200 leşkerên Îranê di heftiya buhurî de ji hêla Derbendixan ve derbasî Başûr bûn ku, ev der 150 km ji Keladîzê dûr e.

Li gor ku nûçevanên ajansa Frans-Press dibêje li dorhêla Keladîzê 2 gundên Kurdan ji binî ve xera bûne û gelek zevî hatine şewitandin. Koçkirina gel ya ji van devaran berdeham e.

Li Japonayê tevliheviya siyasî

Li dû hilbijartina giştî, li Japonayê tevliheviyê siyasî çêbû. Ji sala 1955'an vir ve ev cara yekemîn e ku, Partiya Lîberal a Demokrat (Partiya niha li ser kar) dadikeve hindikayiyê. Lê tiştê hîn balkêş jî ev e ku, hilbijêran pîrranî nedâ tu partiyên. Li ser vî yekê jî aliyê hikûmetavakirinê ve tevlihevi çêbû.

Ev hilbijartin, di 18'ê Tirmehê de qediya. Li gor vî hilbijartinê partiya li ser kar (PLD) jî 511 endamên parlamentoyê 233 heb bi dest xist. Partiya Sosyalîst a Demokratîk jî 70 mebûs stand. Ji sedî 64 hilbijêr beşdarî hilbijartinê bûn.

Hilbijêran bi vî kirîna xwe nişan dan ku êdî ji politîka kevin û terribî (ji rê derketî) têr

xwarine. Ji lew re partiyên kevin ray wînda kirin û partiyên nûçebûyî ku li dijî terribî (xerabûnê) propaganda kirin bi ser ketin.

Di dawiyê de tu partiyên hejmareke têrî avakirina hikûmetê nestand, pêdiviya koalîsyonçêkirinê derket holê, lê teşeya (şêklê) avabûna hikûmetê ne kifş e.

Li Efrîqeya Başûr kuştin didome

Nûçeyên Derve- Dawiya vî hefteya borî, li nêzîkê Johannesburgê du bûyer qewimîn û di wan bûyeran de yek ji endamê KNA (Kongreya Neteweyî ya Efrîqayê) 6 jî, ji endamên Inqata (Tevgera Azadiya Efrîqayê) mirin, hinek kes jî birîndar bûn.

Di bûyera yekemîn de polîsan berrîk reşandin ser konvoja KNA'yê. Ev konvoy jî bo pîroz-bahiya cejna jîdayîkbûna Nelson Mandela ya 75'an, ji Johannes-


burgê dizivirî Sovetoyê. Di vî navberê de erebeyêkê biyanî xwest têkeve nava konvoyê, lê parêzkerên Walter Sisulu (Cigirê Mandela yê Berê) nehiştin. Wan jî berrîk reşandin ser konvoyê, şofêrê erebeyêkê jî konvoyê mir, çend kes jî birîndar bûn.

Li aliyê din 6 endamên Inqata li ser rîya Germistonê ku nêzîkê Johannesburgê ye, ji aliyê 12 mirovên çekdar ve dîsa di eynî rojê de (18 Tirmehê

1993'yan) hatin kuştin.

Dema qewimîna wan herdu bûyeran gelek balkêş bû. Ew bûyer piştî boykotkirina Inqata û çend grûbên rast, a der barê civînên lihevkerin û demokrasiyê de pêk hatin. Nûnerên Inqata gotin ku, bûyerên bi vî rengî de bibin sedema hevkuştinên mezin. KNA'yê jî ev bûyeran wek bûyerên li dijî lihevkerinê û demokrasiyê nîrxand û protesto kirin.

Ceribandina girtina Gündemê bi ser neket



Di mehkemeya Gündemê de, ji saziyên navneteweyî û yên Tirk û Kurd bi sedan nûner ji bo piştgiriye di salona mehkemê de cih girtibûn.

Navenda Nûçeyan- Mehkemeya ku ji bo girtina rojnameya rojane Özgür Gündemê vebûbû, bi xwedîderketina xwendevanên wê û piştgiriya saziyên demokratîk ên navneteweyî neçû serî û 2 meh taloq bû. Doza girtina Özgür Gündemê li ser daxwaza serleşkeriya Tirk, li ser dozên wê yên berê hate zêdekirin. Der heqê rojnameya Özgür Gündemê de, ji roja dest bi weşanê kiriyê û heta niha, bi sedan mehkeme vebûne û gelek ji van mehkemeyan hê jî didomin. Di van mehkemeyan de ji bo berpirsiyarên rojnameyê bi sedan salan hepis û zêdeyî 8 trilyonî jî cezayê pereyî tê xwestin. Berpirsiyarê nivîsaran ê dawî Davut Karadağ, ji ber van daweyan niha di zindanê de ye.

Bi îlankirina şerê giştî yê dewleta Tirk a li hember Kurdan re, rojnameya Özgür Gündemê jî, ji aliyê generalan ve, weke "çapemeniya neyar" hate nixandin. Li ser vê yekê, dozgerê ku di sêdarkirina rojnameyê de wezîfe girtibû, madeya girtina Özgür Gündemê li îdîannameya xwe zêde kir. Rojname, li ser vê yekê bala xwendevanên xwe û raya

giştî ya navneteweyî kişande ser vê mehkemeyê û bangêke piştgiriya hêzên demokratîk û xwendevanên xwe west. Banga rojnameyê "Li dengê xwe xwedî derkeve" bû û bi vê bangê re piştgiriya xwendevan û saziyên navneteweyî mîna pêlên behran herikîn.

Rûpelên rojnameyê, bi îlanên piştgiriye hatin dagirtin. Bi hezaran nameyên xwendevanan mesajên piştgiriye gihandin rojnameyê. Ji sazî û komeleyên navneteweyî jî dengê xurt derket û roja mehkemeyê bi nûnerên xwe ve li salona Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) cihê xwe girtin. Ji van saziyan, Dîrektorê Enstîtuya Çapemeniya Navneteweyî (IPI) Johann P. Frütz û nûnerê wê yê Îsvîçre Max Rapold, ji Federasiyona Rojnamevanên Navneteweyî Jessica Lutz û ji Rêxistina Rojnamevanên Sinornenas Bassonnet, ji bo piştgiriye li mehkemeyê bûn. Wekî din, nûnerên gelek sazî, rojname, kovar û komeleyên Tirk û Kurd jî hatibûne mehkemeyê. Ji van saziyan Egît-Sen, Navenda DîSK'ê, DîSK Lîmter-Îş, DîSK Basîn-Îş, Demîr-

yo-Sen, Türk-Îş Basîn-Îş, Harb-Îş, Sağlık-Îş, Lîman-Îş, Sendikayên Kamûyê, DEP'a bajar û navçeyên Stenbolê, Enstîtuya Kurdî, Weqfa Heq û Azadiya Kurd, Komîsyona Çandî ya KMM'ê, Weşanên Zagros, Rojnameya Welat, Alternatif, Devrîmcî Mücadele, Emek, Odak, Özgür Halk, Özgür Gelecek, Toplumsal Dayanişma, Newroz, Mücadele, Partizan, Barikat, Devrîmcî Çözüm, Yurtsever Emekçiler, Devrîmcî Proleterya li mehkemê amade bûn. Wekî din nivîskar Sungur Savran û hunermend Ferhat Tunç jî hatibûne mehkemeyê. Gelek xwendevanên Gündemê jî, ji ber biçûkbûna salona mehkemeyê li derve man.

Parêziya rojnameya Özgür Gündemê li ser navê 42 evûqatan Osman Ergin kir. Evûqat Osman Ergin, daxwaza girtina Özgür Gündemê, bi brîfinga dawî ya generalan ve girê da û vê daxwazê wek biryareke siyasî nixand. Piştî vê parêziyê, ji bo parêziyêke firehtir mudet hate xwestin û dadgerê mehkemeyê jî, ev doz taloqî 21'ê îlonê kir.

Karker û karmend mafên xwe dixwazin

Navenda Nûçeyan- Karker û karmendên ku di sazî û karxaneyên dewletê de dixebitin, li Tirkîyê û Kurdistanê livbaziye girîng pêk tînin. Karmendên ku, ji demeke dirêj ve ye li dû mafê xwe yê sendikayê digerin livbaziye xwe bi yên karkeran re kirin yek û bi slogana "Karmend û karker mil bi mil ber bi greva giştî ve" bangê greveke giştî kirin.

Armanca van livbaziye zêdekirina meaşan û mafên sosyal in. Ji bo pêkhatina vê armançê, bi dehhezaran karker û karmend li bajarên Tirkîyê û

Kurdistanê rojekê karê xwe rawestandin û meşên girseyî li dar xistin.

Li Stenbolê, karkerên girêdayî Tûm-Sağlık-Sen, Yol-Îş, Demiryol-Îş, Lîman-Îş, Tezkop-Îş, Tarîm-Îş, Basîn-Îş, Dok Gemî-Îş, Tes-Îş û Tûm-Bel-Sen rojek dev ji kar berdan û li gelek taxên Stenbolê meş li dar xistin. Hejmara karker û karmendan digihîşt dehhezaran û cih bi cih polîs mudaxaleyî meşvanan kir.

Livbaziye bi vî rengî li gelek bajarên din jî pêk hatin. Karkerên girêdahiyê sendikayên cur be cur û karmend, li bajarên

Îzmîr, Enqere, Edene, Mersîn, Kayserî, Eskişehir, Samsûn, Denizli û Gölçükê livbaziye girseyî pêk anîn. Li aliyê din, karker û karmendên li Kurdistanê jî, li gelek bajarên di livbaziyan de bûn. Li Mazra (Eleziz), Dersim, Meletê, Dilûk (Enteb, Batman, Wan, Agirî û Amedê jî, livbaziye mezin li dara ketin.

Livbaziye karker û karmendan her roj hinek din berfirehtir dibin û didomin. Hikûmet ji ber van livbaziyan di bêçaretîyê de ye û di çareserkerina pirsgerêkên karmend û karkeran de bêgav maye.

3 pirtûkên Beşikçi hatin berhevkirin

Pirtûkên nivîskar-sosyolog Îsmail Beşikçi yên dawî jî, ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ve hatin berhevkirin. Ev pirtûk ji parêziya mehkemeyên Îsmail Beşikçi yên ku di salên 1991-92'an de pêk hatibûn, berhev bûbûn.

Navê pirtûkên berhevkirî ev in: Mahkemelerin Açtığı Yol (Riya ku Dadgehan Vekir), Bilincin Yükselişi (Bilindbûna Hişmendiyê), Kendini Keşfeden Ulus: Kürtler (Neteweya ku xwe keşif kir:Kurd).

Li ser berhevkerina van pirtûkên mamoste Îsmail Beşikçi, Weşanxaneya Yurt daxuyaniyek belav kir. Daxuyani bi kurtî wiha ye: "Ev berhevkerin qelsî û jarbûna dewletê, li hember weşan û ramênên der heqê Kurd û Kurdistanê de careke din jî diyar kir."

ERNK'ê li Îzmîrê depoya Tekelê şewitand

Li Îzmîrê depoyeke titûnê ya Tekelê ji aliyê Komîteya Herêma Marmaya ya ERNK'ê ve hate şewitandin. Di vê depoyê de 250 ton titûn hebû û hemû tevî avahiya 5 qat şewitîn.

Ev livbazî roja 22'ê Tirmehê ber bi êvarê ve pêk hat. Agir pêşî qata yekemîn zeft kir û bi teqîna bîdonên alkolê ku li vê qatê bûn, hemû avahî şewitî.

Piştî bûyerê, yek li ser navê ERNK'ê li rojnameyan geriya û berpirsiyariya livbaziye girte ser xwe û da xuyan ku, dê livbaziye bi vî rengî zêdetir bibin.

Turîst rezervasyonên xwe îptal dikin

Piştî bûyerên dawî yên ku li Antalya û li Kuşadasiyê qewimîn, îptalkirina rezervasyonên turîstan xwe gihande Stenbolê jî.

Serokê TÜRSAB'ê (Yekîtiya Acenteyên Seyahatê yên Tirkîyê) Başaran Ulusoy li Îzmîrê di civîna Heyeta Kargerîya TÜRSAB'ê de ji xwediyê acenteyan sebr û hedarê xwest. Di vê civînê de xwediyê acenteyan bala raya giştî kişandin ser bûyerê ku li herêma turîstîk qewimîn û dan xuyan ku, tu ewlekariya sektora turîzmê li herêma Egeyê nemaye.

Li gor agahiyên ku ji kargehên turîstîk ên Muğlayê gihiyane me, li wir jî îptalkirina rezervasyonên turîstan bêhtir bûye û ji 80 hezarî bihuriye. Li Marmarîsê jî cihên turîstîk vala dibin, li ser vê rewşê jî karker ji kar tene avêtin.

Xwediyên kargehên turîstîk jî vê yekê gazinan dikin û Wezîrê Turîzmê berpirsiyar digirin.

Ji bo turîstan banga ERNK'ê: 'Meçin Tirkîyê!'

Rêxistina Ewrûpayê ya ERNK'ê jî bo ku turîst neyên Tirkîyê careke din ew îqaz kirin. Bi zêdebûna êrişên otêlan ên li cihên turîstîk wek Antalya û hwd. ERNK bala turîstan bi vî aliyê ve kişand û got: "Qet bila şik ji keşî re çênebin ku, wê reaksiyonên Kurdên li metropolan bi taybetî li Stenbolê û deverên turîstîk bêhtir bibin. Ne hewce ye hûn herin Tirkîyê ya ku ji daxwaza çareserkerina siyasî ya pirsgerêka me re astengiyan derdixe û welatê me ber bi cengê ve dikişîne. Em pîrî caran bangî gelê Ewrûpî dikin ku meçin Tirkîyê, ji ber ku di vî warî de dema tiştêk biqewime emê ne berpirsiyar bin."

Niha jî ne belî ye ku, kî bombe avêtin otêlên Antalyayê û hwd.

Li Girtîgeha Pirrînê greva birçîbûnê

Protestoyên li hember qirkirîna dewletê bi her celebî didome. Piştî ewqas kepengradanan niha jî li hundir girtî ji xwarin û vexwarinê re devên xwe girtin.

Girtiyên Girtîgeha Pirrînê (Semsûrê/Adiyaman) ji bo protestokirina qirkirîna li Kurdistanê û bîranîna 14'ê Tirmehê, ji 19 Tirmehê ve dest bi greva birçîbûnê kirin. Ev grev wê ji 6 rojan carekê bi dorveger bidome. Girtiyên Girtîgeha Mêrdînê jî bi awayê piştgiriye dest bi grevê kirin.

Girtiyên Girtîgeha Dilûkê (Entab) jî bo protestoya qirkirina li Sêwazê û Kurdistanê diyar bikin bi hevkarî ya girtiyên PKK, PRK/Rizgarî, KUK, KAWA, TEKOŞIN, TİKB, TDKP, TKM-ML, TİKKO ditînen xwe anîn zimên û piştgiriya protestovanan kirin.


Çawa roj ji başûrê rojava hilat

Selîm Biçûk

Ciwan bingeha avakirina civakê, pêşengê xwegêriya şoreşê û xemla gulistana welatan in. Ev qanûn li ser her gel û welatî derbasdar e. Ji ber ku ciwan xwendekar, karker, leşker, doxtor, avûqat, torevan, nivîskar û hêviya pêşeroja gelê xwe ne. Helbet rewşa Kurdistanê bi awayekî xurttir vê rolê ji ciwanên Kurd dixwaze. Gelo ciwanên me heta bi kîjan pîvanê daxwaza welat bi cih anîn? Heta bi kîjan qonaxê bûn hêviya gelê Kurdistanê?

Bêguman, di her demê de ciwanên Kurdistanê bi comerdî û bêtirs, bi mirin û manê bersiva hawar û banga Kurdistana xwe dane, xwe bi gorî armanç û daxwazên gelê xwe kirine. Lê mixabin şehîd ketine, bênav hatine jibîrkirin. Di nava xebatê de rizîne û rojên xweş bi gorî têkoşînê kirine. Lê di nav gerava serokatî û bîrdozên sexte de; gēj û winda hatine hilanîn, an jî bêberpirsiyarî di kunc û koşeyên civakê de xwe melisandine, jibîrkirî û winda bûne.

Bi rastî, ev pirseke bingehîn e ku pêwist e bibe cihê lêkolînê berfireh. Di vê nivîsarê de, emê tîrêjek ronahî bidin ser parçeyekî biçûk ji Kurdistanê. Ew jî Kurdistana Başûrê Rojava ye (Başûrê Biçûk). Ev parçeyê ku hisên neteweyî ji demeke dirêj ve, ji dema Bedirxanan ve, ji dema Nûrî Dêrsimî, Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar), Cegerxwîn, Osman Sebrî û qehremanên din ve gurr û geş bûne. Belê, pêlên hisên neteweyî û gelhezî ku ji dema serhildanên Şêx Seîd û Seyîd Rîza ve xwe ber bi Başûr ve kişandibûn, di salên 1957'an de bi avakirina rêxistinên Kurd re xwe gihandin radeyêke bilindtir. Êdî ev parçe hatibû hîlbijartin ku bibe dilê Kurdistanê yê ku li ber xwe dide û xwînê li rehên giyana welat par ve dike. Lewma di salên 1980'yan de Tevgera Rizgariya Neteweya Kurdistanê ya nûjen, ev parçe mîna pîra ku Kurdistanê bi hev girêdide nîşan kir, lê mixabin kesên ku rola vî parçeyî nas nedikirin û taybetiyên wî yên dîrokî, erdnîgarî (cografî) û siyasî nedizaniîn, ev gotin li nexweşiya wan dihat û li hember şerekî giran bi rê ve birin. Hisên neteweyî yên Kurdî ku di vî parçeyî de hatibûn çandin, tilişopên xwe di dilê ciwanan de çekiribûn. Ew ciwan bûn kal, pîr ji wan kalan mirin, lê nîşê rabû jî, dilgerm bû, Kurd bû û welatparêz bû. Roj derbas dibûn. Ew serokatîya kevin a bêpolîtîk û bîrdoz, di nav paşverûtîya xwe de ciwan dihelandin, mîna mûmên ku dişewitin. Di nav gerav û dûmana çewtiyê de winda dibûn, şaş û gēj dibûn, welatparêzî û windabûn, şoreşgerî û xwespêrî. Di mejiyê xwe de bi yek pîvanê digirtin. Di nava vê windabûnê de dijmin jî, bi hemû



giraniya xwe, bi şerê taybetî li hember wan bû. Bê kesbûnî, li ser xaka xwe biyanîbûn û koçerî heta bi pêpelûkên dawî belav dikir. Ciwanê Kurd radibû, çavên xwe vedikirin, xwe didît bînasname, di welatê xwe de penaber, di mala xwe de bêkar û birçî û bi her awayî bêrûmet û şan. Saxekî mirî bû, ne tenê mirî. Lê her roj sed carî dimir. Di vê rewşê de çareya wî dima metropolên dijmin, ji bo gepa nan her karê pîs û giran dikir. Cadeyên Şam û Helebê ji boyaxkar, etar û firoşkarên Kurd tije dibûn. Avahiyên bilind li ser milên betonkarên Kurd ava dibûn. Ne ziman serbest, ne kar, ne xwendin, ne jî ziktêrî. Di nav vê zilm û zorê de hisên neteweyî jî, bilind dibûn. Partiyên Kurd jî, êdî pîr bûbûn. Di destpêkê de PDK-S ji bo ciwanên Kurd bû hêvî. Lê hêviyêke mirî hatibû rûyê dinê. Bêçare û jar, eşretî û feodalî bû. Ev hêvî jî bû deh parçe, bû panzdeh parçe. Êdî bû dûman û lêlan. Di nava çewtî û nakokiyan de hat pişavtin. Em ji bîr nekin rola Partiya Komunîst a Sûrî (PKS) ku bi navê komunîstiyê kosmopolîtîkî heta bi pêpelûkên dawiyê bi rê ve bir, giyana xwesiparî, teslîmkarî û helandinê di nav ciwanên Kurd de diçan. Bi navê înternasyonalîzmê xiyaneta neteweyî diajot.

Di nava van dijberîyan de ciwanên Kurdistanî di nav kolanên metropolan de windabûyî, bêarmanç û di riyên xerab û pîs de neçar diman. Her dem di xelekên vala de dizivirîn.

Di sala 1980'yî de, li bakurê Kurdistanê û Tirkîyê lédana leşkerî pêk hat. Bi vê lédanê re, her kesên ku ji destê conta faşîst rizgar bûbû mîna ku dîrok dîsa xwe vegeirîne, ber bi başûrê rojava ve xwe kişandin. Gelê me yê vê parçeyê mîna her carê pêrgînî xwişk û birayên xwe hat. Êdî malên Başûr tije xort û keçên ciwan bû-



Îro li Şamê taxeke Kurdan heye û bi vî navê jî tê bilêvkirin. Kurdên ku li vê taxê dijîn, bi gîşî dildarê PKK'ê ne. Di wêneyê jor de 'Taxa Kurdan' tê dîtin.

bûn. Pîr kesa xwe ber bi Ewrûpayê ve kişandin û di metropolên împeryalîstan de bêdeng xwe melisandin. Di nav van kes û rêxistinanan de gelek xortên ku reviyabûn ji bo vegereke xurttir hebûn. Hatina wan planeke taktîkî bû. Êdî navê PKK û Apoçiyên li vî parçeyî dihat bihîstin. Di destpêkê de mîna her kesên ku ji ber faşîstan bazdayîn gel pergînî wan jî dihat. Lê roj derbas dibûn, gelê me dît ku roleke din jê tê xwestin. Ev ciwanên şoreşger nehatibûn ku ber bi hembêza împeryalîstan ve xwe bikişînin. Hembêza gelê Kurd armanca wan bû. Amadekariya vegera welat ji bo şerê gelê demdirêj dikirin, pêwist bû ku gelê Kurd ê vê parçeyê bi kêrî wan bê, lê barê mezin jî yê ciwanên Kurdistanî bû. Dibûn çira û ronî, dibûn keleka Pêxember Nuh ji bo rizgarkirina van ciwanan ji windabûnê. Êdî Kurdayetî û welatparêziyê awayekî din stand, darêjêke din stand. Ew ciwanên ku bi salan li çare û riyên rizgariyê digeriyan, bi hêsanî armanca xwe ya windabûyî dîtin. Bi banga "Berxwedan jiyan e" hişyar bûn.

Gotinên mîna "Serxwebûn û Azadî", "Şerê Gel" û "Şerê Çekdarî" ew hisên neteweyî dihejandin û şahîk dikirin. Mîna tiyekî ber bi ava sar ve bireve, ev şoreşger dihatin hembêzkirin. Di demeke nêzîk de, li tenîştên van ciwanan keleha baz û pilingan, perestgeha Rojhilata Navîn û pîrozgeha gelê Kurdistanê li "Bekaa" li gundê "Hilwa" a pîroz û şîrîn hat avakirin. Akademiya Mahsum Korkmaz, şansekî dîrokî bû ji bo gelê Kurd û bi taybetî ji bo ciwanên şoreşgerên Başûrê Rojava.

Riya buhîştê ji perestgeha pîroz derbas dibe. Ji bo ciwanên Kurdistanî jî, rizgariya ji bêrûmetiya sedan salan ber bi gihîştina şerefa xwe ya ku di nav qirêja dîrokê de mayî ramûsandina perestgeha pîroz pêwist bû. Bi dehan êdî berê xwe dan tewafê, xwe nas kirin. Ciwan kî ye? Çi dike û çî jê tê xwestin?

Ji kaniya zelal û paqij serokayetiya ava şoreşa Kurdistanê diherikî. Ciwanên me yên tî bi xweşî jê vedixwarin. Êdî ji zemzema Kurdistanê ava sar, zelal û şîrîn pêl dida. Di serî de şehîdê ne-

Ciwan bingeha avakirina civakê, pêşengê xwegêriya şoreşê û xemla gulistana welatan in. Ev qanûn li ser her gel û welatî derbasdar e. Ji ber ku ciwan xwendekar, karker, leşker, doxtor, avûqat, torevan, nivîskar û hêviya pêşeroja gelê xwe ne.



mir Simayîlê rêber jê vexwar û li pêşiya karwanê Dêrika Hemko govenda şêran kişand. Li dû bûn rist Dijwar, Reşîd, Mihêdîn, Zinar, Sozdar... Li Tirbespiya rengîn xebatê qehreman û cotên pilingan Nezir û Sebrî û bersiv dan û her wiha Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Serêkaniyê, Hesîça, Kobanî û Efrînê bi mîranî rê şopandin û ber bi perestgeha pîroz ve xwe gihandin. Êdê karwan bû bi sedan, bi hezaran ciwanên me li vî parçeyî xwe nas kirin, ji tîbûnê hişyar bûn. Ava zemzem jî, nêzîk bû jê dinoşîn. Êdî bûn rêberên milyonan. Bi xwîna xwe navê ciwanan bilind kirin. Herwiha jî, dibûn mizgînanên serxwebûn û azadiyê. Li ber tîlên rêsayî, li ser sînorên çekirî bi xwînê yekîtiya parçeyên Kurdistanê ava dikirin.

Belê, îro her malbatek ji vî parçeyî bûye xwediye şehîdekî, yan jî dudu û sisêyan. Hîn jî rê tê şopandin, bi hezaran keç û xort li serê çiyên daweta hebûn û rûmetê girtin. Soz dane gel û şehîdan ku heta roja serxwebûn û azadiyê vê rê bîajon.



Hêz û rizgariya gel di destê
rewşenbîrên wî de ye; rewşenbîrên bi
namûs, ramanwer, şiyar û xebatkar...

Anton Pavloviç Çexov

Karê Romê her ev e!

Komara Tirk bi zilamekî xwe dîsa veda. Mirov xwe ranagire, matmayî dimîne. Ev rewş mirov didê ramandin (fikirandin). Mînakîyên dîrokî bi bîr dixîne. Ew bûyerên ku qewimîne ji nû ve cihên xwe bi sifî di mejî û serê mirov de digirin. Gelo dîrok xwe dubare (tekrar) dike? Lê ev bûyera ku di vê dawiyê de qewimî, bivê nevê vê hevokê bi bîra mirov dixê. Lê dîsa biryarê ez dê ji xwendevan re bihêlim. Piştî xwendina nivîsê bila ew bi xwe biryarê bidin.



Îşiklar, xwe bi ava zemzemê jî şuşt, lê dîsa her di çavê romîyan de, îşiklar bû.

Partiya Keda Gel (HEP), ji hêla Dadgeha Qanûnê Binge-hîn ve hate radan (girtin). Bi vê biryara radanê re mebusîtiya Fehmî Îşiklar jî ket. Fehmî Îşiklar niha mebusê SHP'ê (Partiya Gel a Sosyal-Demokrat) ye û Cîgirê Serokê Meclîsa Tirk e. Ev camêr bi xwe serokê HEP'ê bû, ji listeya SHP'ê li bajarê Amedê beşdarî hilbijartina giştî bûbû û ji aliyê gel (%85) ve hatibû hilbijartin. Îşiklar dê vejeriya HEP'ê, lê nefetîlî û li nav SHP'ê ma, cihê xwe yî germ berneda.

Belê ne bi tenê bi xebata xwe, her wiha bi zarê xwe yî xweş û şîrîn jî firiyabû nava dilan (!) Lê dewleta Romê wek roviyê fênek e. Karê xwe pê qedandin û wî serserkî berî erdê dan û cotikê wî qulopanî bû.

Bi xwe der barê axaftinên wî de gelek doz hatibûn vekirin, ku propagandaya veqetînxwaziyê kiriye. Lê ev camêr ji refên SHP'ê veneqetiya, his û pis jê biriya. Li ser vê rewşa wî, mirov xwe ranagire bibêje ku Dewleta Bavo hinek tiştan ber pozên wî xistiye.

Ev rewşa xweşmêrê me yî mebus tiştê ku li Hesen Xeyrî qewimîbû anî bîra min. Hûn dizanin Hesen Xeyrî beriya serhildana Şêx Seîd mebus bû di parlamentoya Tirk de. Li ser daxwaziya Kemo bi timtêla ne-

teweyî ya Kurdî ve diçe parlamentoyê telgraf dikişîne Lozanê ku veqetîna Kurd û Tirkana ji hev naxwaze li ser nûneriya Kurdan. Lê piştî Serhildana Şêx Seîd tê daleqandin. Bi mebesta ku li meclîsa Tirk bi cil û bergên Kurdî propagandayê kiriye.

Ez dibêjim qey Romî jî, karê xwe pê qedandin û lewma ew ji mebusîyê dixwazin binin xwar û bidarizînin. Lê Fehmiyê me yî Ruhayî qare wara wî ye. Dibêje hiqûq ji dest çû. Welê bavo çirandina te çû ji kîsî te. Ez bi vê yekê bawer im ku hetanî mirov Kurd ên bi rengê van xweşmêr û şîrheialan hebin Dewleta Bavo dê hertim li ser pê bimîne. Lê ne dû re ku ew bibêjin "Ji çilî çû yek"

Zana Farqînî

TÎR



Musa Anter

Apê Mûsay enbazê xo dî

De hadrê viradê
Wa bipero Apê Mûsa
Hetê enbazandê xo ya
Hetê Şêx Seîdî ya
Estorê dasipê sernê
Wa şîro
Hetê kodê sipaniya
Warê
Siyamed û Xec a.

Refê keynandê Kurdistanî
Şehîdandê Kurdistanî
Ê yê tilîlî kenê
Û ver a ci yenê.

Megîrê, vernî mekewê
Wa xo
Karwandê şehîdandê xo

Bewnî rê, bewnî rê!
Bivînê!
A verniyêni Zarîfe Xanim a
Ay pey di
Leyla Qasim û Zekiya Alkan

Bend me bê
Wa estora xo biramo
Hetê wardê şehîdan
Dersimî ya

Înan pey di jî, diha û diha rêz biyê.
Bi tilîlî û şahiyana
Ê yê yenê ver a ci
Xort o pancês sere
Bozê Rewanî ser o
Bahrî bin ra vijiyêno.

Wa şîro
Elîşêr û Zarîfe xanimi hetî
Înan a piya xo virado cêr
Bîro Seyîd Rizay hetî
Wextê ci qesb mekerê
Wa jew bi jew ziyareti kero
Dost, enbaz û enbazbendan

O sire di cor a vengê yeno
Erdîş a sipê miyan di
Şêx Seîd o veyndano
Û vano:
Mûsa, Mûsa,
Xortê min o delal
Hetê tiyaya, hetê min a bêrî
Bewnî, ma hemeyê tiya di
Rewnayo ray a to pawenê.
No çend seriyo, ma bendê to yê.

Baxçandê gul û rehanan di
Çinayo zey herîrî miyan di

Lê, ez zana!
Dinya heme jew bo
Eskerê Romî
Bi tanq, top û teyarandê xo

Ha ewro, ha meştî o yo yeno.

Bîrê vernî
Fina nêşenê ey vindanê
Û vernî ci ra bigîrê.

Nîtekîm, to xo resna ma
Xortê ma, Bozê Rewanî
Werzaneno lingandê peynî ser

Bewnî rê, bewnî rê!
O yo yeno
Estorda bindê bahrî
Estorda Memê Alanî
Bozê Rewanî sero o yo

Hîriyê berzi kewna estori ser
Erd û azmîn tê tewr lerzeno
Ca çinêbeno dişmenî dekewê

Memî ra estori deyn kerda
Qandê ki bişo, jew bi jew
Xo şehîdandê
Kurd û Kurdistanî resno
Qandê, lez û bez a înan

Zerîya ci qutifêna
Hîrînda Bozê Rewanî ra.

Estori ci ra deyn kerda

Estori ser ra şemşêrê xo anceno

Bewnî rê, bewnî rê!
A ya bahrî bin ra şîna
Newe jî a ya perena
Hetê wardê şehîdan a
Şîma yê Apê xo vînenê
Zey xortê pancês serî
Senî estori ser o kaykeno û
kêfê ci yo yeno

Zaf û zahf derg bî.
Ez vaja hezar
Şîma vajê sehezar metro dergeya ci

Qandê çiçî, şîma zanê?
Bi seran a hesretey a
Înan anti bî
Bi seran a bêriya înan kerdi

Nê nê diha derg bi.
Diyarbekir ra heta Stanbol
Nê nê şemşêr nêbî
Bes semşêrî mendê.

Şîma yê vînenê, aşnawenê?
Alê Kurdistanî ci destî
Cêr a ê yê bitilîliyan a yenê

Ya, ya!
A qelem a ci bî.
Winî tûj, winî tûj bibî.
Zey zûlîda marî.
Destê xo di şanayê
Û estori hetê azmîniya ramitê.

Dost, enbaz û enbazbend,
Qewm û mileta ci,
Jew bi jew amê ver a ci.
Pêşiyay ci ra û o virari kerd
Bahdo pê ro piya peray û şî
Zey gulbedê Bewranandê sipana

Azmîn di çîman ver a
Bî vînî.

Koyo Berz

Jûjî...

Doğan Güzel

*KES NAXWAZE LI ÎQTIDARÊ XWEDI DERKEVE. HERKES JI BERPERSIYARIYÊ DIREVÊ...



Di sefera xwe ya Kurdistanê de

Çiller piştgirî da qetlîaman

Navenda Nûçeyan- Serokwezîra Tirkîyê Tansu Çiller, 13 wezîrên kabîneya hikûmeta nû û Serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş roja 22 û 23'yê Tirmehê li çend bajarên Kurdistanê geriyar. Tansu Çiller û heyeta wê pêşî li Culemêrgê di Mala Polîsan de civînek li dar xistin, dû re li navenda Culemêrgê axivîn. Piştî Culemêrgê derbasî Şirnexê bûn ji Şirnexê jî bi helikopterên leşkerî çûne Batmanê.

CIVÎNA LI MALA POLÎSAN

Di dawîya civîna ku li Culemêrgê çêkirin de Tansu Çiller da xuyanişkirin ku, ji bo başkirina rewşa herêmê wê xalîkarî û terşvanî bi pêş ve bibin. Çiller di axaftina xwe ya li hember Culemêrgîyan de jî da diyarkirin ku, li ser sozê xwe sekiniye û di dawîya du hefteya dema hikûmeta nû de hatîye herêmê.

Çiller di axaftina xwe de çih da van gotinan: "Ez dayîk im û rewşa we baş fêm dikim. Hemû rûniştvanên vê herêma me an jî herêmên Rojava, Kurd an jî Tirk giş bira û xwişkên hev in. Ev welat ye me gişan e û emê wî biparêzin."

Serokwezîr Çiller jî wek hemû rayedarên dewleta Tirk ên berê li ser xurtiya dewletê sekinî û got ku dewleta Tirk pirr xurt û bi hêz e, lê PKK qels û bêhêz e. Dema ku Çiller diaxivî, car caran polis û cerdeva-

nan gotinên wê dibirîn û destê xwe jê re li hev didan.

Piştî gelek soz û waadan Tansu Çiller û ekîba xwe ji Culemêrgê derbasî Şirnexê bûn. Li Şirnexê pêşî qerargehên leşkerî ziyaret kirin û piştgirîya xwe ji bo qetlîamên ku li Kurdistanê pêk tînin, pêşkêş kirin û ji bo berdewamkirina "van qetlîaman" dilxwaziya xwe anîn zimên.


PIŞTGIRIYA QETLÎAMAN

Tansu Çiller li Şirnexê jî gotinên xwe yên li Culemêrgê dubare kirin û li wir jî cerdevan û polîsan bi xurtî jê re li çepikan dan. Alîkarê Serokwezîr Erdal İnönü jî, di axaftina xwe de siyaseta koalîsyona berê parast û da diyarkirin ku, ji niha pê ve jî li ser bingeha programa koalîsyona berê, wê siyaseta xwe bidomînin.

Di dema gera Tansu Çiller û heyeta wê de hejmarek serokên belediyan û nûnerên partiyên siyasî daxwaz û pêşniyarên xwe pêşkêşî Serokwezîr Tansu Çiller kirin.

PÊŞNIYARA SEROKÊ BELEDIYAN

Serokê Belediyeya Culemêrgê Şükrü Çalli, yê Geverê (Yüksekova) Necdet Buldan, yê Çelê (Çukurca), yê Navşanê (Şemdinli) Selahattin Çiftçi, Serokê SHP'a navendê Ganî Çalli, yê RP'ê Arafat Atan, yê DEP'ê Hamîr Geylanî di daxuyaniya ku pêşkêşî Tan-



Tansu Çiller, çawa ku haya wê ji tu tişî tune ye, ji nû ve hebûna gelê Kurd înkâr dike û li ser bingeha vê siyaseta nijadperest dixwaze pirsgrêka Kurd "çareser" bike.

su Çiller kirin de, dan diyarkirin ku pirsgrêka yekemîn a herêmê nebûna demokrasiyê ye. Di daxuyaniyê de van ditinan çih girtine: "Li herêma me gelek pirsgrêk hene, lê ya herî girîng û çareserkirina wê herî acil nebûna demokrasiyê ye. Nebûna demokrasiyê bi xwe re şewitandina gundan, nehiştina damezirîna sendîkayan û pêkanîna zilm û zorê tîne. Ji bo çareserkirina van pirsgrêkan birihkirina demokrasiyêke rasteqîn pêdivî ye. Ji bo destpêka bicihkirina demokrasiyê jî pêwîst e ku gundên hilweşandî û şewitandî

ji nû ve bêne avakirin. Gundî û hemû mirovên ku zerarê dîtîbin, zerarên wan bi tezmînatê bê telafîkirin û ji niha pê ve hemû riyên demokratîk û mafên mirovan bi temamî bînin vekirin. Li aliyê din, divê ku rêxistina tîmên taybetî û cerdevanî jî, ji holê bînin rakirin".

PAKÊTA ÇARESERKIRINÊ

Tansu Çiller û heyeta wê bi xwe ji çareserkirina pirsgrêkên Kurdistanê pirr durr xuya dikin. Di pakêta wan a çareserkirina problemên Kurdistanê de qet behsa demokra-

sî û mafên mirovan û pirsgrêkên siyasî nayê kirin. Li gor bernamê wan du trilyon û nîv lîrayên Tirk wê ji bo Kurdistanê bê veqetandin. Ji vî peryê jî pêşî trilyonek wê ji bo çêkirina rîyan, dibistanan bê xerckirin. Diyar e ku ev jî tenê wê bi kêrî çûn û hatina wesîteyên leşkerî yên ku gelê Kurd qetîl dikin bînin û avakirina dibistanan jî bi taybetî bi mebesta asîmîlekirina ziman û çanda Kurdî ye. Di programa Tansu Çiller de pêşvebirina terşvanî (heywan xwedîkirin) xalîristinê (xalîcîfî) de jî wê alîkariyê bidin kesên ji herêmê.

Tîmên taybetî piştî Gîhadînê li Wanê qirkirin pêk anîn;

'Pêşî zarok mirin'

Navenda Nûçeyan- Tîmên taybetî di 19'ê Tirmeha 1993'yan de li Zozana Sunduzê ku li ser navçeya Miksê (Bahçesaray) ya Wanê ye avêtin ser konên koçeran; 15 zarok, 8 jê jin tevîhev 23 kesî kuştin. Di vê êrişê de 3 kes jî birîndar filitîn. Li gor kesên ku ji vê qirkirinê birîndar xelas bûne, ev bûyer ji aliyê 6 kesan ve pêk hatiye. Çapemenî û televizyona dewletê weke ku bûyer bi destê PKK'ê qewimîbe, raya giştî agahdar kirin.

Kesên ku ji vê qetlîamê sax filitîne baweriya xwe bi kirina PKK'ê nayîn û ji wan yek bi

navê Ahmet Sevgîlî der barê pêkhatina bûyerê de wiha diaxive: "Ber bi êvarkî ve 6 kes hatin zozanê. Her yekê ji wan çakêt, şal û kurtik li wan bûn. Tev bi Kurdiyêke gelekî xerab dipeyivîn. Hema bibêje temenê tevan li derdorî 20 salan bûn. Di destê yekî ji wan de bêtêl hebû. Zarok û jinan di konekî de civandin, dû re kesê ku bêtêl pê re bû bi der-na re mijûl bû şûn de jî, jin û zarokên ku li hev kom kiribûn dan ber gulleyan. Ez ji piyê xwe birîndar bûm û min xwe avêt piştî diwarekî. Berî ku vê ecêbê pêk bînin ji me pirsîn ka bê cerdevanên me hene

an na. Me ji wan re got nînin. Jixwe dû re jî ev yek bi me kirin. Ez ne bawer im PKK'ê ev kiribe."

Piştî vê bûyerê Nûneriya PKK'ê ya Libnanê bi daxuyaniyekê diyar kir ku ev bûyer raste rast ji alî kontrgerîla ve pêk hatiye û li gor ku bi axaftinên xwe yên bi berpirsiyarên gerîla yên herêmê re kirine ev rastî hê çêtir diyar bûye.

Kuştina kesên sîvil ya bi vî rengî metodek ji şerê taybetî ye. Ev mînak Zozana Sunduz ne ya yekemîn û ne ya dawî ye jî. Heta niha gelek caran dewlet li hember gelê

sîvil qirkirinên bi vî awayî pêk aniye û her carê jî bi çapemenî û televizyonên xwe ev kirinên qirêj û hovane avêtiye ser PKK'ê. Ji bo kesên ku meraq dikin lînihêrtina arşîvên rojnameyên pêşverû bes in. Armanc ji vê ew e ku li hundir ji tîkoşînê durrxistin û xerakirina moralê gel e; li derve jî, ji platformên demokratîk yên navneteweyî tecrîtîkirina pirsgrêka Kurd e. 23 kesên ku 15 ji wan zarok in, li Zozana Sunduz ji alî kontrgerîla ve hatin qetilkirin li Goristana Belediyê ya Miksê bi beşdariya nêzîkî 1000 kesî hatin binaxkirin.

Kesên ku hatin kuştin bi navê xwe ev in:

Azad Sabirli (7), Yunus Sabirli, (2), Zehra Ağaç (1), Sevim Ağaç (7), Suzan Turan (10), Yıldız Güzel (13), Nezahat Elmali (12), Eylem Elmali (4), Azîme Elmali (14), Melîke Yaşar (18), Muhammed Yaşar (8), Hanim Yaşar (4), Hürriyet Sevgîlî (12), Semra Sabirli (17), Bahar Turan (20), Gülnaz Söylemiş (18), Hediye Turan (20), Hîkmet Sabirli (20), Müzeyyen Yaşar (42), Sedef Elmali (35), Meşîde Ağaç (32), Beyhun Sevgîlî (40), Huri Samsa (55) û Muteber Sabirli (38).

Qêrîna dayîkeke Kurd:

'Ev zilm û zora ku li me dikin, dê bibe agir û bi canê wan bikeve'

Xeyrî Polat

Roj tune ye ku li Kurdistanê gundekî neyê hilweşandin û şewitandin. Roja duduyê meha Tîrmehê, leşkerên Romê avêtin ser gundê Hirareş.

Hirareş, gundekî di qûntara çiyayê Gabarê de ye. Gundekî bi şînahî ye. Zevî û bexçeyên Hirareş xwedî û xwedanên xwe xwedî dikir, gundiyan hewceyî tu kesî nedikir.

Hirareş gundekî wisa bû ku tu caran xiyaretê ranegirtiye ser xwe û li gelê xwe xiyaret nekiriye.

Dema ku leşker diavêjin ser Hirareşê, gundiyeke ji zeviyê ber bi gund ve tê. Gundiyeke bi navê Ömer Çetîn, dema nêzî gund dibe dibîne ku leşker dorra gund girtine û gundiyan li qada gund civandine. Ömer Çetîn vê yekê ji xwe re nake mesele û dikeve nava gund. Lewre li gor dilê xwe yê saf, ew bêsûc e.

Leşker pêşî rê lê digirin û çend pirs jê dikin. Dû re wî jî tevî gundiyan dikin. Piştî re jin û zarokan ji zilaman vediqetînin û dixin mizgefta (camiya) gund; zilaman jî dibin dibistanê. Leşker ji gundiyan re dibêjin: "Hûn hemû terorîst in, hûn alîkariya terorîstan dikin, emê we hemûyan bikujin." Îşkence bi van gotinan dest pê kir û her çû diwartir bû.

Ji aliyekî ve jî dest diavêtin namûsa gundiyan. Dixwestin wan bînin qada gund û tazî bikin.

Ömer Çetîn, di bin îşkenceyê de, dibîne ku, jina wî tînin dibistanê û wê tazî dikin. Ömer Çetîn bi hewldaneke mezin xwe ji destê leşkeran rizgar dike û xwe ji qata yekemîn a dibistanê diavêje xwarê... Lingên wî dişkên.

Dayîka Ömer Çetîn Hacî Fatma Çetîn, wiha qala lêdana kurê xwe dike: "Kurê min hê 22 salî bû. Xortekî bi şeref û namûs bû. Welatparêz bû. Dema ku dît dê jina wî tazî bikin, xwe ji destê leşkeran xelas kir û xwe ji paceya dibistanê avêt. Leşker weke gurên har lê civiyan û bi pihîn û qûndaxên tivingan dest bi lêdana wî kirin. Wisa lê dixistin ku weke ji heftê salî ve bav û bapîrên wan kuştibe."

Leşker, piştî îşkenceyêke dûvedirêj, dikevin bin çengê Ömer Çetîn û wî 2 km. ji gund dûr dikin. Li vir leşker Ömer Çetîn didin ber gulleyan û dû re laşê wî diavêjin ser hejikan û agir berdidinê.

Dayîka dilbikol gotina xwe wiha didomîne: "Tenê ev kurê min hebû. Dema ku zilamê min mir, hê 7 salî bû. Min wî bi hêsiyê mezin kir. Tu sûc û xetayê wî tune bû. Tenê Kurd bû. Her roj li Kurdistanê lawên me têne kuştin. Ez bi

ber nakevim. Ez bi ber dikevîm ku ewqas îşkence lê kirin. Bi wê îşkenceyê jî dilê wan rehet nebû rabûn şewitandin. Em niha ji gundê xwe derketine û hatine Cizîrê."

5 GUNDÎ GULLEBARAN KIRIN, JI ZINAR AVÊTIN Û BOMBE KIRIN

Dema ku leşker ji gund derdikevin 5 zilam û 8 jin jî bi xwe re dibin. Di navbera Hirareş û Zivingê de, zilaman

derdixin ser zinarekî bilind û gullebaran dikin. Laşên wan ji zinarê diavêjin xwarê. Hemû dikevin ser dilê hev. Leşker, ji bo ji mirina wan bawer bibin bombeyek jî diavêjin ser wan. Laşê gundiyan ji hev parçe parçe dibin. Lê yek ji gundiyan ku di bin laşê hevalên xwe de maye, tesîr ji bombeyê nabîne. Laşên hevalên wî, wî diparêzin. Ahmet Güler (Kurê Mehmûd) piştî ku leşker vedikişin, bi birîndarî xwe digihîne gund û gundiyan ji bûyerê agahdar dike. Gundî

laşên Ahmet Güler, Saîd Şen, Beşîr Baskak û Ahmet Güler (Kurê Emer) ên parçebûyî tînin gund û vedîşêrin.

Hirareş niha vala ye. Dewlet, heftiyek li ser hev çiyayê Gebarê bombebaran kir, lê tu tişt bi dest nexist. Li hember gerîla di şerên rû bi rû de jî tîk diçû. Ji ber van sedeman heyfa xwe ji Hirareş hildan.

Weke ku dayîka Ömer Çetîn, Hacî Fatma Çetîn jî dibêje: Dê ev zilm û zora ku li Kurdan dikin, rojek bibe agir û bi canê wan bikeve.



Gundiyan Hirareş piştî qirkirina leşkerên Romê ji gundê xwe kôç kirin û li Cizîrê bi cih bûn.

Derewên dewletê û rastî

Navenda Nûçeyan- Ew qirkirinên ku hêzên dewletê çekiribûn û avêtibûn ser gerîla roj bi roj ronî dibin û rûyê dewletê reş dikin. Roja çarşemê (21'ê Tîrmehê 1993) CHP'ê (Partiya Komarê ya Gel) du pêşniyar dan meclîsê; ji bo lêkolînên qirkirinên Başbağlar (Erzîngan) û Gîhadînê.

Ew bûyera "Başbağlar"ê piştî qirkirina Sêwazê pêk hatibû, ji ber ku ev gund sunî û piştgirê MHP'ê bû, hêzên fermî bi lez û bez gerîla mîna berpirsiyar nîşan dan. Lê gundiyan ji kovara Gerçekê re gotin; ên ku ew tişt pêkanîne dirûşmeyên wek "Bijî PKK, Bijî TÎKKO" avêtine û hêzên dewletê tu operasyonên bi rêk û pêk çenekirine. Li aliyê din Turkish daily news'ê nivîsand ku, ew bûyer bi destê gundiyan elewî çêbûye û yên ku bûyerê pêk anîne kesên bi serê xwe ne.

Meseleya Gîhadînê jî li dû geştê mebusên CHP'ê derket ronahiyê.

Jixwe me ew rastî berê jî dizanibû û di rojnameya Welat, hejmara çuyî de weşandibû. Piştî geştê hinek mebusan derket holê ku, kontrgerîla ev qirkirin çekiriye.

Qirkirina dawî li Miksê (Bahçesaray) çêbû, berpirsiyariya dewletê di vê kirinê de jî derkete holê. Çavkaniyên gerîla di roja yekemîn de tewandariya dewletê îlan kirin. Ew kesên ji qirkirinê xelas bûn jî wiha gotin: "Cerdevanên me nîn in û tu gelemşe di navbera me û gerîla de nîn e, ji ber vê yekê em texmîn nakin ku ev bûyer bi destê gerîla çêbûbe. Jixwe yên ku ev kar kirin, cilê sivil lixwe kiribûn û Kurmanciya wan jî zehf qels û xerab bû.

Lê piştî van hemû rastiyan dîsa jî dewlet û çapemeniya fermî dev ji derewkariyê bernade, dixwaze wan bûyeran wek çekên şerê psikolojîk bi kar bîne.

Qetlîam kîna me xurttir dikin

Welat, Berlin- Qîrîn û nalîn, hawar û gaziya zarokên me, mirovên me, kal û pîrên welatê me, doh li Koçgirî, Dêrsim, Palû, Agirî, Mereş, Şirnex û wekî wan, îro jî dûmana laşên mirovên me li Sêwazê, kîn û xezeba me li dijî dijminê mirovayetiye xurttir dike û yekîtiya gelê me tîne meydanê.

Protesto, miyîng û hevkomên neteweyî û navneteweyî ji aliyê pîr mirov, hêz û rêxistinên aşîxwaz û mafnasên gelan ve, li dijî barbarî û hovîtiya li ser gelê me di bajarê Sêwazê de û di welatê me Kurdistanê de berdeham dikin.

Ev protesto û lanetkirin, pirranî ji aliyê gelê Kurd ve hatin li dar xistin. Di van hevkomên û xwepêşandan de, gelê me çî elewî, çî sunnî û çî jî êzîdî bi hev re, mil bi mil qetlîama Sêwazê ku ji aliyê mirovên girêdayî bi MHP'ê (Partiya Teverga Netewepêrest) û dewleta faşîst a Tirk ve hatibûn plankirin, protesto kirin û dikin.

Ji ber ku van bûyerên nemirovayetiye û hov li Sêwazê û li hemû Kurdistanê bi-

gihin guhên hemû gelên cîhanê û her wiha ji bo diyarkirina vê yekê, ku di Tirkiyê de, azadiya ramanî bi şeweyekî barbar tê fetisandin û tenê faşîzm û şovenîzma Tirk di welatê de hukim dike, ji aliyê Yekîtiya Elewiyên Kurdistanê ve, di roja 16.7.1993'an de, li bajarê Berlinê di kolana Kottbosser-Tor de, rûniştin û xwebirçikirin û hevkomên neteweyî û navneteweyî hatin saz kirin û dê heya roja 24.7.93'an werin berdeham kirin.

Ev aksiyona ku, weke cejneke neteweyî tê xuyan, ji aliyê hevalên

- * KTP/Kivilcim
- * Hevalbendên rojnameya Barîkat
- * Pirtûkxaneya Ufuk
- * Bazirganên (esnafên) demokratên Kurdistan

* Alîkarên Rojnameya Welat li Berlin ve jî tîn alîkarî kirin. Ev aksiyon dê di roja 24.7.1993'an de bi dayina germiya aşûrê biqedê.

Di roja 31.7.1993'an de jî gotûbêjê siyasî li ser rewşa Kurdistanê heye.

PÊNÛS



Amed Tigrîs

Pêkhatina Tûranê ji ber dev û dest çû

Pişti belavbûna sistema Sosyalîst hikûmet û dewleta Tirkîyê bi hemû partiyên ve çepik lêdan ku dê xelalên wan ê Tûran bibe rastî. Dê ji deryaya Adriyatîkê heta dîwarê Çînê dewleteke Tirk bê damezirandin. Ew jî Tûran bû ku ji sed salan ve ye Tirkên nijadperest xem û xeyala wê dikirin.

Ji Ewrûpayê, ji Bosna-Hersekê ve dest pê kirin. Bosna-Hersek, Makedonya, Tirkên Bulgarîstanê, Yewnanîstanê, Qibrîsê, Tirkmenên Iraqê, Azeriyên Îranê, Azerbeycan, Tirkmenîstan, Kirgîzîstan û heta Kazakîstanê dane ber xwe heta derya Çînê çûn. Li ser rîya yekîtiya Tûranê Kurd, Ermenî û Îranî dibûn strî û asteng û diketin pêş wan. Ji vê yekê jî dest bi xebatê kirin. Serokkomar Turgut Özal û Serokwezîr Süleyman Demirel dest bi gera xwe ya welatên Tûranê kirin. Li wan deran di bin fotograf û alên "Gur" de şûr û mertalên Cengîzhan û Tîmûr Leng diyarî dan Özal û Demirel.

General û MÎT'ên devbixwîn şandin Azerbeycanê û bûn eqilmend û şewirmendên Elçibeyê paşverû. Türkes jî gurê xwe yê dev bixwîn şande alîkariya Elçibey. Navê ajansa xwe kire Tûran. Erbakan û grûbên dîndarên din jî hizbilahên xwe şandine Bosna-Hersekê. Artêşa Tirk, tîmên taybetî û kontra jî li Kurdistanê dest bi kuştina Kurdan kirin. Her wiha di nav xwe de wezîfe par kirin.

Li Tirkîyê jî partiyên dîndar heta yê lîberal û çep hemû di îdeolojiya Tûran de an ya Tirkîtiyê de yek in. Ji derî çend grûbên şoreşger ên biçûk û çend kesên serbixwe û ronakbîr ên din hemû yek in. Ferqa Erbakan, Çiller, Mesud Yilmaz û Ecevit, Baykal û yên din tune ne. Her partî, grûb û derdor li ser navê îdeolojiyê ne nijadperestîya Tirk diparêze. Çapemenî jî her wiha ye. Bi rastî li Tirkîyê yek partî û yek çapemenî heye: Partiya Tirk û çapemeniya Tirk.

Li gor Tirkîyê, piştî belavbûna sistema Sosyalîst, pêkhatina Tûranê hatibû der û dest. Yanî mercên (şertên) çêbûne temam bûbûn. Lê, sal di ser re derbas nebû Tûran ji ber dev û dest çû. Tirkan li Bosna-Hersekê winda kirin. Li Trakyayê bi ser neketin. Di doza Qibrîsê de paşve gav avêtin. Hemû dergeh û tak li Denkaş hatin girtin. Ew li ber îstifakirinê ye. Li Kurdistanê şerê PKK'ê mezin û berfireh bû. Politîka Tirk li Iraqê îflas kir. Ermeniyên Nagora-Karabaxê girtin û ber bi Bakuyê ve diçin. Elçibeyê nijadperest reviya. Li Azerbeycanê rejîm hat guhertin. Tirkên faşîst ên Tûranîst jî wir direvin. Peymanên boriyên petrolê ku dê bihatan Tirkîyê, hatin rawestandin. Kazakîstan, Tirkmenîstan û dewletên din têkiliyên xwe ji Tirkîyê birrîn. Wan bi xwe dît ku, her tiştên Tirkîyê bi derewan e. Ji aliyê din ve pêkanîna Tûranê welê ne hêsan e. Dinya çavê xwe ji vê yekê re bi hêsanî nagire û nabêje "belê".

Ji ber vê yekê dema her berpîrsiyar û pisporekî Tirk diaxivê dibêje, "Heger Tirkîye bikaribe meseleya terorê çareser bike, di dema pêş de li Rojhilata Navîn û li Asyayê dê bikaribe rolekî mezin bileyze..."

Yanî pîrsa Kurd li pêş pêkhatina împaratoriya Tûranî bûye asteng. Li gor wan heger ew xwe ji vê astengê rizgar bikin dê bigihêne Tûrana xwe ya Guristan. Bi guran Guristan çênabe. Gur bi xwe bêbext û zalim in. Di colên guran de kîjan bide pêş e dawî yê pêş dixwin. Ev qanûnê guran e. Her wiha dom dike. Elçibey da pêş yê din ji paş ve dev lê kirin û xwarin. Özal da pêş ji paş ve dev lê kirin û ew xwarin... Denkaş da pêş ew jî gez kirin. Erdal İnönü di rêzê de ye!...

Bi rastî gur bêbext in divê mirov pişt nede guran! Hem jî gurê mancoyê har û devbixwîn! Lê, divê neyê jibîrkirin, li herêmê jî derî gur, şêr, hirç û cinawirên din jî hene ha!..

Pîrsa Kurd li pêş pêkhatina împaratoriya Tûranî bûye asteng. Li gor wan heger ew xwe ji vê astengê rizgar bikin dê bigihêne Tûrana xwe ya Guristan. Bi guran Guristan çênabe. Gur bi xwe bêbext û zalim in. Di colên guran de kîjan bide pêş e dawî yê pêş dixwin. Ev qanûnê guran e. Her wiha dom dike. Elçibey da pêş yê din ji paş ve dev lê kirin û xwarin.

Li ser çewtnivîsîna 'ko' yê têbiniyek

Emîn Terzî

Di kovar, rojname û bi gelemperî di çapemeniya Kurmanciya me ya salên dawî de "ko" ya "Pronav (cînavk) a Gîrêkî" bi çewtî "ku" tê nivîsandin.

Ev çewtiyek e. Çewtî ye çî ku li gor rêzokên (qaîde) rêzimana Kuramacî "ku" an jî "kû" cihê ye û "ko" cihê ye. Heryek gerek ji aliyê wateya (mana) xwe ve, gerek ji aliyê komikê (hevokê) ve rola bi cih tîne ve gelekî ji hev dûr in.

Li ser rêzimana Kurmancî carra pêşin rehmetiyê Celadet Bedirxan xebateke berfireh û mantîkî pêk aniyê, ev keda xwe di kovara Hawar a pîr giranbûha û bi rûmet de weşandiye. Weke tê zanîn, Celadet afirandêrê alfebeya Kurdî ya hemdem e jî, ku em tev îro vê alfebeyê bi kar tinin.

Li ser vê babetê, pêşiyê emê pêdandên (tesbît) rehmetiyê Celadet deynin nêvengê û dû re jî têbiniyên xwe binivîsin.

Celadet Bedirxan, di kovara "Hawar"ê de ji hejmeta 27'an ve (15 Nîsan 1941) dest bi weşandina "Bingehên Gramêra Kurmancî" dike û jî destpêka zanîstiya rêzimanekê, heya hurgilî (teferûat) yê wê çî lazim in giştan datîne ser rûpelên kovara xwe. Di hejmeta 34'an (15. Çirîya pêşîn, 1941) de bi gotina wî "pronav", an jî bi gotina me ya îro "cînavk" (zamir) e ronî dike û pronavan li ser şêş texlîtan parve dike. 1- Pronavên Kesî, 2. Pronavên Îşarkî, 3. Pronava Gîrêkî, 4. Pronavên pîrsiyarkî 5.

Pronavên Nebinavkirî 6. Pronavên Xwedî (an jî xwemalîn).

Ezê niha jî pênûsa wî, vê babeta "Pronava Gîrêkî" bêtî guhartin biguhezinim vir. (Hawar, hejmar: 44, 20. Gulan.1942)

PRONAVA GÎRÊKÎ

Xal 99- Pronava gîrêkî, dikeve peşiya navdêr an pronaveke din û wan bi komeka ko di pey wan re têt girê dide. Di zimanê Kurmancî de ji ber her du mijar û zayendan bi tenê yek pronava gîrêkî heye, ew jî "ko" ye.

Pronava "ko" di komekê de, li gor navdêra ko dinimîne carina kirar û carina jî bireser e. Kirar:

Mirovê ko tu dîtî birayê min e.

Yê ko tu dîtî birayê min e.

Bireser: Mirovê ko te dîtî birayê min e.

Yê ko te dîtî birayê min e.

Çend mîsalên din:

Destmalên ko te kirîne spehî ne. Ez îro li hespê ko te dihî (duhî) ji gund anî siwar bûm. Çiyayê ko li pêş me ye, Herekol e. Mifta ko min pê ev derî vedikir winda bûye.

(Xal) 100- Herwekî di cih û deverê de, bête gotin, di zimanê Kurmancî de jî "ko" ya pronav pê ve "ko" yeke din jî heye. Ew "ko" gihanek e û wezîfa wê di qîsetê de weke dine e. "Ko" ya gihanek dikeve navbera hevokên komekê û wan digehîne hev. Ji lew re ev "ko" her gav dide pey lêkerêkê:

Min got ko ez nayim

Ew hatin ko me biezimînin.

Ew "ko" bi xwe gava bi mane "heke" ye, hingê beriya lêkerê têtê gotin.

Ko Lezgîn hat emê herin nêçirê...

Dîsa di babeta "Pronavên Pîrsiyarkî" de çêra (behsa) "kû" yê dike, wiha dinivîse:

"Pronavên Pîrsiyarkî

(Xal) 105- Kû: Ev pronav bi tenê ji bo pîrsiyariya cih têtê gotin.

Tu çuyî kû? Ew li kû bû? Hon ji kû têt?"

Hewar, hejmar 45

30 Nîsan-1942

Celadet "ku" yê bi kar nayne, her "ko" û "kû" yê ronî dike. Di wateya "Pronava Pîrsiyarkî" de ev çî "ku" bête nivîstî, çî "kû" ew qas girîng nîn e. Lê divê em dest ji vê çewtiya "ko" bi "ku" guhertinê û wilo nivîsinê berdin. Çima, em rêzimana Celadet afirandî û bikaraniyê di her nivîsên xwe de ji xwe re dikîn rêber û çima di vê meseleya "ko" yê de em dev ji wî berdidin? Ez li ber vê yekê nakevim. (Ango: Ez tînegîhim). Tiştê min fêhm kirî "ko" Cînavka Gîrêkî ye û "kû" an jî "ku" Cînavka Pîrsiyarkî ye, bi kêrî pîrskirina cih têt. Ne hewce ye û tu heqê me nîn e ku, em van tevlihev bikin. Ji aliyê din ve tu zehmetiyên vê jî nîn in. Şûna em bi çewtî binivîsin, qey ne xweştir û ne hêsantir e ku em bi rastî binivîsin?

Kifşê kifş dixuyê ku, ser vê re du wezîfên "ko" yê hene: A pêşî me li jor danî, ya diduyan jî dîsa weke Celadet gotî gihanek e. Ev her du "ko" hene û çapemeniya me van her duyan jî weke neyî dihesibîne. Çî hikmet e gelo?

Nirxandinek li ser 'ko' yê

Zana Farqînî

Zimanê Kurdî bi hemû zaravayên xwe ve hewceyî lêgerînê girîng in. Pirtûkên ku li ser rêzimana hatine amadekirin li gel şaşî û çewtiyan gelek kêmasiyan jî di hundirê xwe de dihewînin. Ji bo zaravayê Kurmancî hîn jî rêzimanekê bi rêk û pêk ku ji aliyê hemû zimanzanan ve tê pejiwandin nîn e. Hê jî em tev, Celadet Bedirxan di vî warî de jênebihur dibînin û didine ser rêça wî. Bi rastî bi saya wî me gelek rîya xwe ronî kiriyê û di warê rêziman, rastnivîs û alfabe yê de bi pêş ve çûne.

Di gel van tiştên wî yê erênî hin aliyê xebatên wî jî ber rexnekirinê nefelîtinê. Mebesta min ne ronîkirina wan aliyên wî yê xebata wî ne. Ez dixwazim bi kurtasî li ser nivîsa Emîn Terzî ya bi navê "Li ser çewtnivîsîna 'ko' yê têbiniyek"ê rawestim.

Birêz Emîn Terzî bi mînakên ên jî Hewarê dixwaze 'ko' yê ji aliyê wezîfeyên wê ve zelal bike. Hem jî bi mînakên Celadet Bedirxan. Rehmetiyê Bedirxan wê

ji aliyê peywîrê ve senifandiye (tasnîf kiriyê).

1. Pronava Gîrêkî

2. Pronava Pîrsiyarkî

3. Gihanek

Celadet ji bo pronava (cînavka) gîrêkî 'ko' yê, ji bo pîrsiyarkî 'kû' yê û ji bo gihanekê jî dîsa 'ko' bi kar aniyê.

Rast e, 'ko' her çiqas jî hêla teşeyê (formê) ve yek be jî, lê ji aliyê maneyê ve ji hev cihê ne. Çima? Lewre di zaravayê Kurmancî de me berê jî di rûpelên Welat de weşand ku, bihevguherîna tîpan heye. Ango tîpên ku jêderk û kan a wan yek e, bi hev diguherin. Mînak: 'O' û 'Û'. Hûn-hon, bandor- bandûr. Emîn Terzî dibêje ku Celadet Bedirxan li ser 'ku' yê nasekine, anga behs nake.

Dixwazim bibêjim ku 'ko', 'kû' û 'ku' hemû jî bingehê ne, lê maneya wan ji hev cihê ne. Dibe ku bingeh 'ko' be û di pêvajoyê de guheribe. Dîsa bi mînakên dixwazim mijarê ronî bikim. Hon, hûn, hun û win. Ev her çar peyv cînavka kesane ya pîrrehejmariya duyemîn e û ji

desta "ez" e. Hon guheriyê li teşeyên din. Ango 'o' li 'û', 'u' û 'i' yê, 'h' jî li 'w' yê guheriyê.

Dîsa em peyvên hev deng bidin; Nav. Mînak: "Navê min bîyan e", "Nava me ne baş e", "Di vê navê de", "Di nav bexçe de yek heye". Dema em li van mînakên binêrin wê mirov têt derxe ku, ji aliyê maneyê ve ji hev cihê ne, lê hev deng in.

Ji ber vê yekê ne hewce ye ku mirov li hember peyvên hev deng derkeve û bibêje, diwarî çêdike. Na, di hevokê de jê têt zanîn bê di çî maneyî de hatiye bikaranîn. Ev rewş anga hev dengî di hemû zimanan de heye û gelemşeyên girîng dernaxin.

Hem jî aliyê ku li gorî min 'ko' bi 'kû' û 'ku' yê guheriyê û hem jî, ji aliyê hev dengiyê li mijarê bê nihêrtin wê mirov têbîgihê ku mesele çî ye.

Nîşe: Daxwaza Welat ew e ku, tîkildarên zimên li ser xalên ku gengeşî li ser wan têt kirin nêrinên xwe bi awayekî nivîskî diyar bikin da ku em gelemşeyên xwe yê rêzimanî bi lezgîni hel bikin.

Kultur û kulturvan

H. Sevkan

Gelek rexne tene Hunerkomê, ji hêla kulturvan ve, ev rexne ji wiha ne: Kulturvanên Hunerkomê bêhtirên xwe gelek kêmaniyan dikin, porên xortan dirêj e, neynokên keçan boyaxkirî ne, dirêj in û hwd. Berî her tişti, divê ku kultur bê naskirin, kultur (çand) çi ye, kulturvan kî ye? Rast e, ji sedî 80 "kulturvanên" Ewropayê wiha ne!

Kultur, çanda miletekî, derzika piştê wî ye, eger bişkê zû bi zû hevdu nagire, eger bigire ji heya demeke dirêj, wê piştixûz be! Ya me ji dibê ku li xwe daneyn em bibêjin ku piştê me şikestiyê, lê dîsa ji derziye, ji ber wê yekê ji niha em hinekî piştixûz in.

Helbet em li ser kultur çi ye, zehf nasekinin, kultura miletekî gelek tiştan di nav xwe de tine ziman, emê bêhtir li ser meseleyên kesbûnê bibêjin, çanda Kurdî bi kurtahî ev e: Hez kirin, torewa civakê, li hev guhdarkirin, rabûn û rûniştandin, mêvanperwerî, paqijî û hwd. (Ji bilî gelek tiştên din) Her wiha gelek tişt hene ku, negatîv in, di nava çanda me de hene, em bi xwe li dijî wan in, ji ber ku tu feyde nagihîne civaka me, teng dihêle, bi pêş naxe û girtî dihêle. Ev adet her kes dizane bê çi ye.

Ew tiştên ku li jorê hatin gotin û gelek tiştên din ên pozîtîv, eger di kesbûnekê de civiyên, mirov kare bibêje ku ew kesbûn, an ji ew mirov kulturvan e. Lê yên ku ji hêla mîlet û min ve ji tene rexnekirin, ew ne kulturvan in, ew xebatkarên çandê ne.

Dibe ku hinek bipirsin an ji bibêjin ku divê xebatkarên kulturê, kulturvan bin "divê" ez jî dibêjim ku "divê" her însan kulturvan be! Niha hemû mirovên misilman baweriya wan bi Xwedê û ola îslamê heye, lê gelo hemû mele ne? Hemû zerdeştî pîr in, hemû ewelî dede ne, hemû fileh keşe ne?.. Na! Nimûneyek din, niha şoreşger jî welatparêz e, welatparêzek jî welatparêz e, lê şoreşger dibe sembola welatparêziya mirovên Kurd, an jî kîjan mîlet be. Ji ber wan yekê di nêrîna min de ku ji van xebatkarên kulturê re nayê gotin kulturvan, tevî ku di nava wan de hene bi rastî jî kulturvan in. Ji ber ku ewên ku ev gotin kulturvan in, tenê beşekî ji kultura Kurdî temsîl dikin, ew jî politik e. Muzîk, govend û hew!.. Ji ber ku kulturvan bin wê bi Kurdî zanibin!.. Ji ber ku şoreşger jî welatparêz bêhtir wezîfeyên welatparêziyê zane, ji lew re jî berî welatparêz, şoreşger xwe feda dike!

MUZİK

Bê çawa her miletek zimanê xwe heye, wisa jî her miletek formekî muzîka wî ya taybetî heye. Lê bê çawa mirovê me bi zewqa zimanê Kurdî nizane ku çiqasî zengî û dewlemend e, wiha jî bi zewqa muzîka Kurdî jî nizane. Ji stran û muzîka xwe dîr dikeve, demê ku tê li helbestekî Kurdî guhdar dike, guhê xwe digire, ji hundir derdikeve û gelekî aciz dibê. Belkî ku ne ji fedîyan be wê biqîre û bibêje: "Ev çi ye, guhên me qul bû?"

Em dîsa bîne ser nimûneyan. Ji van nimûneyan jî qasetên teybê û çekirina şevan û şadîmanîyan. Ji sedî 99 di erebeyên Kurdan de ev tişt peyda dibê: Eger 20 qaset hebin, di erebeyê de, di malên wan de ji wan 20.an şoreşgerî bin, klasîk yan yek heye, yan jî tune û 15 jê yan Tirkî ne, yan jî erebesk in, ku dengbêjên wan muzîk û zimanê Kurdî eşkere, li bazarên Stenbolê difiroşin. Çima?.. Gelo şoreş li Kurdistanê tune û tu qaset û dengbêj tune ne ku vê şoreşê binin ziman? Ez bawer nakim ji ber ku, ji 100'î 95 guhên xwe nadin bê ka ev dengbêj, yan jî ev helbest çi didê mirov.

Di vê dema dawî, piştî ku zimanê Kurdî "serbest" bû, gelek hozan û dengbêj derketin. Bûne cambaz ku, dest bi firotina ziman û stranên Kurdî kirine, niha ew bi tenê, helbestên klasîk yê gelî, yê hozanên Hunerkom û hwd. dibêjin, bi Kurdî nizanin, van qasetan diavêjin bazarê, mirovê Kurd jî mîna tiyê li avê digere, dikire. Çima? Gelo dema ku tê de Xezal Xezal dibêjin, ji M.Arîfê Cezrawî xweştir dibêjin? Dêrê Hewiyê ji Ayşe Şan û İsa Berwarî xweştir dibêjin?

Na!.. Demekî mesele bi rih û guhên guhdaran ve girêdayî ye, ev dengbêj, baş rihê gel nas kirine, eger ne ji tevgera serxwebûnê be, belkî tiştên din jî bikir-

Niha hemû mirovên misilman baweriya wan bi Xwedê û ola îslamê heye, lê gelo hemû mele ne? Hemû zerdeştî pîr in, hemû ewelî dede ne, hemû fileh keşe ne?.. Na! Nimûneyek din, niha şoreşger jî welatparêz e, welatparêzek jî welatparêz e, lê şoreşger dibe sembola welatparêziya mirovên Kurd, an jî kîjan mîlet be.

na. Bi vî awayî dengê xwe digihînin guhan, li helbestan çend derbokan zêde dikin, di bin navê zengînkirinê de, ji bo ku tam bibê erebesk, hinekî muzîka Erebi jî lê zêde dikin û diavêjin bazaran. Nimûneyek ji Hunerkomê, ji nav 43 qasetên wê ku ji hemû



Cawê ku Beriya Zayîne di 6500 sal berê de hatiye çekirin di kolana Qotêberçem de hate dîtin. Ev caw arkeologan matmayî hişt.

Ji Kurdistanê dîrok dipijiqe

Di kolana Qotêberçem (Çayönü) de cawek hate dîtin ku, ta niha cawê herî kevin e di dinyayê de. Ev parçeyê caw ku ji keten hatiye raçandin, hate daxuyan ku aîdê Beriya Zayîne ya salên 6500'î ne.

Kolan, ji hêla Unîversîteya Stenbolê Fakulteya Edebiyatê û Unîversîteya Chicago Oriental Institute ve tê kirin.

Kolanên li Qotêberçem ji salê 1964'an ve tê kirin û ta niha gelek bermayê dîrokî jî vê herêma kolanê bi dest hatiye xistine. Qotêberçem li nav sinorê navçeya Diyarbekirê, Erxenê ye.

Cawê ku ji lifê ketenê hatiye çekirin bi awayekî ku li ser qiloch (stro) pêçandî hate dîtin. Lê bi awayekî ku bûye fosil.

Doç. Dr. Mehmet Özdoğan ku endamê Beşa Prehistoriya ya Fakulteya Edebiyatê ya Unîversîteya Stenbolê ye li ser dîtina cawê ji keten wiha peyivî: "Tiştê herî girîng ew e ku caw ne ji

hiriyê ye, ji keten, e. Ev dide nîşan ku raçandin cara pêşîn Beriya Zayîne 6500 sal berê dest pê kiriye. Ev jî dide xuyan ku 8500 sal berê caw hatiye raçandin."

Ev cawê ku ji kolana Qotêberçem hatiye derxistin, niha ji aliyê pisporê raçandinê, zan-yarê Holandî Prof. Dr. Gillian Vogel-Eastwood tê vekolandin.

Ev kolanên salên dawî didin nîşan ku, Kurdistan di şaristaniya mirovahiyê de gelek cihê girîng digire. Ta niha li cihanê warê herî kevin ê mirovahiyê Mezopotamyaya Jêrîn dihate dîtin. Lê bi kolanên Mezopotamyaya Jorîn wek Newala Çolê ku di bin avê de maye û Qotêberçem (Çayönü) tê xuyan ku cih û warê herî kevin li Mezopotamyaya Jorîn e.

Bi dîtina bermayên dîrokî yê li Kurdistanê tezê dîrokî yê li ser şaristaniya mirovahiyê pûç dibin.

rengan heya niha hene, hem klasîk, hem jî hinekî zengî, hem jî bi orkestra, yanî tewere hemdemî, ji nav wan helbesta tewere erebesk, an jî qaseta ku erebesk tê de pîr be ew tê girtin. Ez dixwazim vê yekê bi nimûneyekê bidim naskirin. Em li Holandayê bûn, li şeva 15 saliya PKK'ê, keçekê li ser qasetekî Hunerkomê ya dawî deng kir, wiha got: "Qaset pîr xweş e, lê bi taybetî helbesta (?) Rast e qaset xweş e, lê

xwe bi vî rengî jî wê helbestê bi gazin e. Helbest bi xwe jî di navbera muzîk û gotinê de dîrbûn ji erdê heta ezman heye, wekî din gelek kêmanî tê de hene. Dîsa jî, ji ber ku erebesk bû hema cihê xwe di dilê wê keçikê de girt!

Nimûneyeke din ji bo pîrozkirina şevên 15 saliya PKK'ê, ji herêmekê ku ji binî ve tesîra muzîka biyanî lê nebûye, hozan hatin. Hozanên berî 30 salî ji Ermenîstanê, ji Gurcîstan, ji Moskov, her wiha hevalên hozan ku ji Tirkîyê hatibûn, lê ew ne wekî hozanên din yê ku li Tirkîyê ne. Ew ziman û strana Kurdî nafiroşin, lê belê helbest û muzîkê tam bi Kurdî digihînin guhên guhdaran. Her wiha li şevên berî niha û bi taybetî li şevên HEP'ê hinek hozanên ku "Abone" lê bi Kurdî dibêjin hatin. Tiştê ku me li herdu şevan û şevên me yê din jî dît û bala me bi ser xwe ve kişand ev bû, keç û xortên me, jin û mêr, ji bilî çandehez û rewşenbîran, çi dikirin? Baqê gulên ji bo erebeskê datanin, lê ji bo Cembelî, Delal Hay Delal, Ehmedo Ronî û helbestên şoreşgerî, guh dihatin girtin, protesto dibûn. Keç û xortên me derdiketin derve, sebeb hemû ji ber ku erebesk

û Tirkî û derboke li nav wan helbestan de tune bû

Ev rexne ne tenê ji bo Hunerkomê ye, belkî %25 para Hunerkomê nakeve, ev rexne ji hemû însanê Kurd re ye, bi taybetî yê ku rexneyan dikin, lê rexneyan qebûl nakin.

Nuqteyêke pîr û pîr hesas û muhîm heye, mirovê me carekê nehatiye, xwe li ser naveroka helbestekê newestandîye bê ka helbest çi dibêje, wê ji nêzik ve binirxîne, eger dengê dengbêj xweş be, melodî, ritim lê be û erebesk be, ji bo xwe bes dibîne. Li vir rola ku stran dilîze, yan jî şîr dilîze dibe sifir; ev yek jî, ji ber ku guhên xwe hîni dengê derbokê kiriye, ev yek heya dawiyê di nav helbestên Tirkî de heye, ku kes nizane çi dibêje, yan jî feyda xwe da tenê qulupandina deng. (helbet ne hemû helbest)

Divê ji hêla çandê ve xwe pê bigihînin, vî eniyê bi zanebûnê bidin xebitandin, divê ku şoreşeke mezin ji bo çandê çêbibe. Ev yek jî ne tenê ji Hunerkomê tê xwestin, di nêrîna min de, ji 7 saliyê Kurdistanê heya 70 salî divê ku cihên xwe di vê şoreşê de bigirin.

Li Kurdistanê rista olê



Gavan Koçer

Civaka Kurd piştî ola zerdeştîyê di demeke derg û dirêj de ket bin bandora ola îslamê. Her çiqas gelê Kurd ola îslamê peji-rand jî, ji dinyaya din îzolebûna wê bû sedemê dirêj domandina bandora ola zerdeştî. Wek tê zanîn Kurdistanê ku li ser rîya talankirinê dirêj dibû, bû qada pevçûnê ku, dagirkeran ji bo berjewendiyên xwe li dar dixistin. Ango êrîşên ku ji her aliyê ve dihatin (ji wê demê de pirranî jî, ji aliyê Ereban) Kurd mecbûrî koçberiya qûntara çiyân dikir. Ew jî têkiliyên wî bi gerdûnê re teng dikir. Lê car din jî heta hatina Tirkên a li Anadolîyê jî Kurd bi peji-randina ola îslamê di bin perrên împaratoriya Ereban de wek êsîrên azad dijiyan.

Li Anadolîyê bi serketina Osmanîyan re peydeyê wê wêlatê Kurdistanê jî ket ber qedereke din. Şerê di nava Safewî û Osmanîyan de cara yekemîn belavbûna cografîyaya Kurdistanê wek fîzîkî derxist holê. Jixwe heta wê domanê di jiyana gelê Kurd de ola îslamê ketibû radeyeke bilind. Kurdan zordariya herî mezin jî, ji pê ve dîtî. A herî mezin jî dagirkeriya Selçûkan û Mogolan ve hat. Dagirkeriya 1050 jî, ji bo pêşveçûna Kurdistanê ji aliyê aborî û civakî ve bû çepereke mezin. Zordestî û talaniya barbaran bû sedemê koçkirina gelek Kurdan ber bi wêlatên Ereban ve.

Ji wê pê ve jî axa Kurdistanê ji bo şerê di nava dagirkeran de bû qada pevçûnê. Zêdetir jî di sedsala 16 an de ji bo şerê Osmanîyan û Farisan bû qada şanoyê ku zordestan ji bo leyîstokên xwe diceribandî. Civaka Kurdan ku di wê domanê de bi tevayî di bin bandora avahiyên feodalîzmê de westiyabû, çes-

pandina karên herdu împaratoriyan hêsantir kir. Wek tê zanîn di wî warî de rista Îdrîsî Bedlîsî, ku dixwest avahiyên kevneşopî bidomîne, mezin bû. Bi alîkariya wî bi giraniya xwe Kurdistan ket bin destê împaratoriya Osmanîyan û ji wê rojê pê ve jî pêşveçûnên civakî û çandî di bin serdariya Osmanîyan de derbas bûn. Li vir mirov dikare ji xwe bipirse ku gelo çima Bedlîsî li hember Farisan, Osmanî girtin?

Di wî warî de car din ol rîstêkî mezin dilîze. Kurd ku heta sedsala 16'an nêzî 900 sal di bin tesîra mezheba ola îslamê ya sunî de mabûn, pey xapînên hikûmeta navçeya Osmanîyan ketibûn û Faris wek alîgirên mezheba pêncemîn (şîî) didîtin. Stratejiya Îdrîsê Bedlîsî, ku ji bo Osmanîyan dixebitî jî, bî tenê parastina li dijî Farisan bû. Ev jî di livê de bêhneke fireh da Osmanîyan.

Împaratoriya Osmanîyan, ku di birêvebirênê de xwediyê cerîbokên kûr bû, nexweşiya civaka Kurd baş analîz kir û li gor wê jî derman da; serokeşîr kirin xwedî hêz û bi wî qeydeyî jî di nava wan de dubendî afirand. Eşîrên ku dixwestin li hember zordestiya eşîrên din xwe biparêzin, dewleta Osmanî wek haqdan didî. Dema eşîrên Kurdan dubendiyên di nava xwe de diferîsandin û dixwestin li dijî desthilatdaran derkevin, wê çaxê têgîha umetê dibû çeper û astengîya lihevhatinê. Ev rewşa han jî her aliyê ve gelê Kurd diavêt nav tengezariyan. Ev tengezariyên mezin bûn sedema belavbûna îskeleta gelê Kurd û ji holêrakerîna hoyên netewebûnê.

Parçe parçe li dijî dagirkeran serî rakirin û livdan ji aliyê dagirkeran ve bi awayekî hov hate

şikestin û bi tenê bû encama windakirina bîr û bawerîya jiyandinê. Ev jî civaka Kurd ji bingehê lerizand û spartina wî da lezandin. Tadehiya herî mezin mirov dikare bibêje li ser axa Kurdistanê ceribandina azîneyên mêtîngehiyê bi demajoyeke dîrokî ve gelê Kurd raspandina sîstema dagirkeriyê kir.

Her çend têgîha umeta ola îslamê dibû çepera lihevhatina Kurdan jî, ew kotekiyên ku li dijî wan jî aliyê Osmanîyan ve bi navê ola îslamê dihatin kirin û di nava gelê Kurd de bizêviyên (bêhizuriyên) mezin pêk dianî. Ev jî di nava gelê Kurd de dibû sedemê pêşveçûna fikrên gelêrî. Mirov dikare Ehmedê Xanî yê ku di medreseyên olî de di sedsala 17'an de hiqûqa ola îslamê xwendibû wek rêberê wan fikrên gelêrî, bibîne. Di nava gelê Kurd de pêl bi pêl belavbûna ramanên gelêrî ku heta wê domanê bi rengê ola îslamê, ku di rastiya xwe de awayê (forma) despotîzma Osmanîyan girtibû, hatibûn boyaxkirinê, torên mûnandî û ramanên kohne diqelişandin û zêdetir derdiketin holê. Ev bi awayê gelêrî, lê bi rengeke olî sax dan û bi destpêkirina sedsala 19'an ve dest bi dana fêkiyên hêja kirin. Serhildana Bedirxaniyan (1854-1885) û a Şêx Ubeydullah (1880) ku bi şêklê olî damezirandina Kurdistanê beş bi beş azadkirî, ji xwe re kiribûn bingeh. Ev jî ew berhemên dî ne.

Her çend Kurd di serîrakerîna xwe de bi ser neketin û hêza wan bi awayekî hovane hat şikestin û tîkçû jî, pêşveçûna ramanên gelêrî rêvebirên împaratoriya Osmanî ditirsand. Lewma jî despotîkên Osmanî ku heta niha bi ola îslamê neteweya Kurd bindest kiribûn, mecbûrî

Wek doza wî KT bi çi navî dibin bila bibin hemû saziyên olî ji bingehan ve xera kirin û li dijî doza Kurdan ji xwe re kirin alîgirên kêlekî. Di nav wan de mirov dikare Diyaneta Tirkîyê, Partiya Nîzamê, ya MSP'ê, a Refahê, Şêxê Kextayê, ku rejîma 12'ê Îlonê ew derxist holê, tarîqata Silêmaniyan, a Işıkçıyan û yên ku xwe "hizbilahçî" dibînin, bihesibîne.

ceribandina azîneyên nû bûn.

Ji bo wê jî di sala 1891'î de "Siwarên Hamîdî" û di 1892'yan de jî "Xwendegha Eşîretan" hat li dar xistin. Bi van re jî, li her cihî mektebên olî û pişeyî vedibûn. Forma van mektebên olî û kevneşopî bû û pirraniya xwendevanên van mekteban jî, ji zarokên serokeşîran pêk dihat. Mirov dikare bibêje ku, Osmanîyan bi wî qeydeyî dixwest ji bo domandina desthilatdariya xwe ya li Kurdistanê ji ciwanên Kurdan ku dê di pêşerojan de bibin palpişt û alîgirên wan, çineke olî û neteweperestî ya Osmanîyan biafirîne. Hengê domandina siyaseta Osmanîyan wê hêsantir bibe. Lê pîrr neajot, xwendevanên van mekteban dest bi doza şopajotîna Kurdayetî kirin. Bi wê siyaseta jî bername û stratejiyên Osmanîyan bi cih neketin ku ev jî bû sedema girtin û qedexekirina mektebên eşîretan.

Lê car din jî, li medreseyên olî ramanên gelêrî xurt dibûn. Hatina Atatürk û qedexekirina tekeyan fersendekî mezin xist destê Kurdan. Mele Seîdê Kurdî û Şêx Seîd her yekî bi rêçê xwe li dijî hikûmeta navçeyê dest bi berxwedanên mezin kirin. Seîdê Kurdî ku di wê domanê de xebateke ramanî diajot û bi tîkçûna serhildana Şêx Seîd pîrr eşîya bû xemgîniyên xwe bi awayekî zelal anîbûn zimên: "Ez bi nebeşdarbûna serhildanê birayê xwe şermezar û mehcûb im. Lê ezê ji îro şûn ve, şopa wî bi hemû hêza xwe bajom." Lê mixabin ji Kurdistanê koçkirina wî û îzolekirina wî ya li rojavayê Tirkîyê xebatên wî yên hêja û pîrozî bi destên alîgirên Komara Tirkîyê hatin lewitandin û xera kirin. Berî her tiştî mirov dikare bibêje hoyên zemanê fersenda nivîsandina pirtûkan nedida Se-

îdê Kurdî. Ji aliyê din ve jî ew di bin çavan de bû û nivîs û gotarên wî ji destê nobetdarên wî ve digihîştin alîgirên wî. Jixwe ew xebata wî ji aliyê serbazên ku, xwe wek nûrewîyan didan nasandinê, dihat çav lê gerandin. Ev jî tiştêkî balkêş e ku tîkîliyên serbazan ên bi dewletê re xurt bûn û ev jî fersendekê mezin dida guherandina pirtûkan.

Wek doza wî KT bi çi navî dibin bila bibin hemû saziyên olî ji bingehan ve xera kirin û li dijî doza Kurdan ji xwe re kirin alîgirên kêlekî. Di nav wan de mirov dikare Diyaneta Tirkîyê, Partiya Nîzamê, ya MSP'ê, a Refahê, Şêxê Kextayê, ku rejîma 12'ê Îlonê ew derxist holê, tarîqata Silêmaniyan, a Işıkçıyan û yên ku xwe "hizbilahçî" dibînin, bihesibîne. Di van saziyan de mejiyê ciwanên Kurdan bi navê ola îslamê dihat şûştin û ji bo berjewendiyên dagirkeran amadehiya cîhadê dihat kirin. Li van deran kalîkê Kurdan Şêx Seîd bi nakokîya Îngilîzan dihat kevirkirin, lê neyarê Kurdan ê mezin Sultan Yavuz wek ewliyayekî mezin î alema îslamê dihat nasandin. Ên ku dema şerê Qibrîsê tînin bîra xwe dizanin ka çawa xortên Kurd bi dilxwaziye jî bo şer ketibûn rêzê.

Gelo çima ew Kurdên ku di van sazî û komeleyên olî de cih digirin, bi çavê dewletê li tîkoşîna rizgariya neteweyî dinêrin?

Mirov dikare bibêje ku, çawa çepên Kurdan di bin bandoriya çepên Tirkên-ku di bingehê de girêdayê dewletê bûn-de man her wiha oldarên Kurdan jî di bin tesîra oldarên Tirkên û oldarên neteweyên din de man. Bi gotîneke din wan ola îslamê bi nêrîn û dîtînan oldarên gelê desthilatdar didîtin û dibînin. Ev di hîmê xwe de tiştêkî psîkolojîkî ye û girêdayî avahiyên Kurdan ên civakî ne. Ji ber ku avahiyên civakî yên mêtîngehî ji her alî ve ji yê Kurdan pêşvetir bû û ev jî di şîrovekirina ayet û hedîsan, afirandina perspektîvên jiyana civakî û tîgîhiştina gotaran de, lêkolînanên gelê xwedî hêzê dikirin xwedî biryar jî. Ji ber wê jî mesaja îdeolojiya berendamên karbidestan, ku bi xwe ve tîgîha umetê, ku di rastiye xwe de serdestiya Tirk, Ereban û Farisan e, tîne. Gelê Kurd, ku nasnameya xwe wînda kiribû û di valayî de ajne dikir, wek hêza erdkêşiyê dikişand û derûniya wan seranser diguherand. Lewma jî, dema îro rêvebirên dewletên dagirker (Tirkîye, Îran, Sûriye, Iraq) ji bo tunekirina şerê azadîxwaz planên hevpar amade dikin, li ba saziyên olî qebûleke mezin dibînin.

Em bi kurtî dikarin bibêjin ku, bi navê ola îslamê xapandina civaka Kurd proseseke dirêj û dîrokî ye. Ji ber ku mirov bi karîbe polîtîkayên mijokdariyê pûç bike û wê prosesê vegeirîne ser rêça rast, azîneyên bi bîr û bawerî pêwîst in.

Bilûrvanê erebeya bêxwedî Ian Anderson û Jethro Tull

Selda Keskîn

Jethro Tull, muzîka populer ku di salên 1960'î de ketibû boranê derxist û anî. Endamê komê hemû beng û şeyda bûn, tiştê herî girîng Anderson li wir bû. Ji sala 1960'î heta "93" yan li dik û sahneyê ne.

Jethro Tull, navê zanyarekî ye ku di sedsala 17'an de jiyaye. Tull navê zilamê ku cara pêşin makineyê çandiniyê çêkirîye, ye. Kom li gorî navê xwe kincên xwe li xwe kirine, li dikê şov kirin. Kincên kome jî, simbola tinaziya wan a bedbînî ya dinyayê an jî rewşa çanda wan a ku pê bawar bûye.

Bi ya min divê mirov yeko yeko li ser endamê Jethro Tullê raweste. Lê gava li ser mejiyê komê Ian Anderson bê rawestî û nivîsandin, tê wê maneyê ku, hemû endamê komê dê werine naskirin. Lewre îlahê komê Ian Anderson, di dawîya 1967'an de dest bi lédana flûtê kiribû. Bi rastî di muzîkê de qet ne şareza jî bû. Bi tenê hinek li gîtarê di-

da. Taybetiya wî "biyaniya wî" û pêkenîna bedbîn bû. Dema dest bi lédana flûtê kiribû, rewşeke nipînû anîbû "muzîka progressive" (ê(muzîka pêşverû). Na Ian li flûtê nade, vegotina enstrûmantal û gotinî ku bi hevûdin re dipeyivin, bi nependiyekê bi hev re dibezîyan. Ango weka zewaca hesp û kihêleke Ereb û Îngilîz, adepteyî muzîkê dikir.

Hewayaya îronîk a di besteyên wî de bi lezgîniyê mezîna rê di da ku, pêjneke "humour" (nuktedan) a sift şîna bibe.

Ev bengî, heta ev zilamê ku ji xwe bi xwe re digot ez 'bûyerek şîzofrenîk' im, ne wek ji derve ve dixuyîya, ye. Bi rastî ji tu dibistanekê mezûn nebûbû heta çend meh dom kiriyê û berdaye lê bi şexsiyeta xwe ya serhildêr biryar dabû ku dê herkesî bide şaşkirin. Pirr dixwend û bi her tiştî re jî têkildar bû. Bi teferûatên hûr û bi naverokên mezîna re têkildar dibû.

Di encamê de "dînekî" ku jiyandê cidî didit, lê li her tiştî bi nêzîkahiyeke îronîk dinihêrt, derketibû holê.

Anderson; "Mirov ji ber por-dirêjbûna me di kuçeyan de ji me direviyan, lê dema hinek bi me re dipeyivîn, lê diwerqilîn ku em jî afirandiyên normal ên ku dişibûn mirovan in" digot.

Tiştê ku derûdorên muzîkhez zêde li serê gengeşî (munaqêşe) yê dikin, terzê jiyana Ian e. Piştî derketina wan, bi pereyên ku qezenc kiribû ji xwe re çewlîkeke mezîna kiribû û di hindurê wê de jî xelfetxaneyê (keşîxaneyê) 500 salî hebû. (Xebatên qeydê yên komê li vir dehate



Jethro Tull, 1991

kirin.)

Wekî din li welatê xwe, li Îskoçyayê jî çewlîkek ji bo hilberandina masiyên Somon ava dike, heta di dinyayê de payeke mezîna hilberandina masiyên somon di destên xwe de digire. Tê gotin ku, ev piyase ji Ian di hate pirsîn. (Em bidin kifşkirin ku masiyên Somon di dinyayê de masiyên herî buha ne.)

Ianê xwedî xeyaleke jînê ya nelibar û simbolê helwesta muxalîf, ji ber ku di vî pazarê de tédikoşiya, ev tewra wî nedihate ecibandin.

Em hinek jî, ji xeyalên wî behs bikin. Ez dibêjim qey helbesteke wî, ji bo vî yekê bes be

EREBEYA BÊXWEDÎ

Volgaya reş li min taqîp dike.

Erebeya bêxwedî

Her kî be dî telkerlekê

Erebeya bêxwedî de

Peyariyên şil, avahiyên zirav

Bêdengiya ber deriyên ku

hatine tarîkirin.

Ez dixwazim derkevim der, ji bo

bijîm

Ev gavên ku bi lezgîniyê min avêt

di farê

Erebeya bêxwedî de

Derketin nîna e di kuçeyên

teng de

Ën bi kevirên peyariyan hatine

çêkirin

Ji rûyê erebeya bêxwedî

Derî li rûyên min tê girtin,

du silûekê mirovan şewq dide

Ez dibêjim qey me hev li

deverekê dîtîbû.

Ez nikarim zêde ji te re vebêjim

Ez bi peymanê herkesê ku

dixwazim min vexwînin re

razî bûm.

Ez li bajarê tursî

Erebeya bêxwedî diajom

Nivîskarê "Erebeya Bêxwedî" di Jethro Tull û dinyayê de, tiştê ku lê digeriya û cihê ku dê qet nedîta, pêjnê biyaniya ku dageriyayê îhtirasê ya wî mirovî honadineke muzîkal dide der.

Mîmarê tégina (mefhûma) ku di komê de çebûbû, Ian bû. Heta di gotinên stranên de em bi hêsaniyê subjektîfiya wî dikarin bibînin. Deperasyonên hundirî yên ku di hunermendên dahî de tên ditîn...

Ev helwesta Ian, hem di pêşandeyê dikê (sahneyê) de û hem jî di albûmên wî de xuyane.

Wî bi bêbirariyê erjeng û bi septîzmê ve gelek cureyên muzîkê hemêz dikir. Jethro Tull, heta îro çî çêkirin? 28 adet albûm derxistin. Ji vanan bi albûma çaremîn Aqualung'ê (tupê oksîjenê ku di binê avê de tê bikaranîn) gihiştin şûretê.

Jethro Tull, di dinyayê de koma ku herî dirêj bi hev re maye belkî ya yekemîn be. Endamên wê qet neguherîne. Ji roja avakirina komê hata niha endamê komê tim eynî mane. John Evans (baterîst) endamê komê yê bi tenê ku, guhê wî ji aliyê muzîkê ve hatiye hêvotin û ji aliyê muzîkê ve xwedî agah e.

Jeffrey Hammord (bas gîtar) û Ian Anderson (flût). Jeffre û Ian bi guncayîşt (qabiliyeta) hunerî û bi pêjn û hîsan komê li ser piyan digirin.

Em dikarin kesên ku di Jethro Tull de dixebitin navên wan wiha birêzin: Ian Anderson, John Evans, Jeffrey Hammond, Martîn Barre, David Pegg, Doane Perry, Micak Abrahams, Clive Bunker, Martîn Allcock, David Palmer.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Hov û mirov

Mirov bi eql, hiş û mantiqa xwe tiştan dikin û çareserî ji pirsgirêkan re dibînin. Hov û cenawer jî bi penc, qil û didanên xwe wehşet û cenawerîya xwe dikin.

Hov faşîst in, mirov humanîst in; hov heywan in, mirov însan in; hov xwînxwar in, mirov dost û yar in.

Kesê ku mirov be, divê li çareya tiştan bi mirovahî bigere; bi hiş û mantiq bibîne û bipişkêve. Tadeyî, lédan, kuştin û qirkirin karê cenawer û hovan e.

Mirov jî hemû ne weke hev in. Hinek jê jîr û şareza ne; hinek jî gêj, xêw û efsene ne, pepûk û belengaz in; hinek dîr bîn û kûr bîn in; hinek jî dînik û debeng in, pêşiya xwe nabînin, nafikirin, fêma nakin.

Lawê Paşê (Erdal efendî) ne ji wan e, ne jî ji van e. Belkî ji koma ewterî, belengaz û efseneyan e. Herçî hiş û eqlê ku hebû jî Demîrel jê biriyê, belengaz kiriye û berdaye meydanê.

Wilo bûye pêkenîna û efsene ku, Mesût Yilmazê Laz jî, li Viyanayê ji rojnamevanên Ewrûpî re digot: "Erdal ji siyaset û diplomasiyê fêma nake". Yanî bêhiş û efsene ye. Ku bi rastî jî wilo ye. Her ku bûye cîgirê Sserokwezîr jî, yekcar bêhiş û mantiq bûye; tevlihev kiriye.

Wilo bûye pêkenîna û efsene ku, Mesût Yilmazê Laz jî, li Viyanayê ji rojnamevanên Ewrûpî re digot: "Erdal ji siyaset û diplomasiyê fêma nake". Yanî bêhiş û efsene ye.

Ku bi rastî jî wilo ye. Her ku bûye cîgirê serokwezîr jî, yekcar bêhiş û mantiq bûye; tevlihev kiriye. Ev bûn çend hefte ku di televizyonê de dibêje: "Operasyon didomin, dê bidomin jî, dê mehmetçîk di demeke nêzîk de reh û ajara anarşiyê biqelînin. Em nahêlin memleket parçe bibe. ordiya me, bi qeweta leşkerên me, dê darsa xayîn û bolçiyân (parvexwazan) bide. Dê KT (TC) îlelebet payidar bimîne".

Beriya her tiştî, divê Gedê Paşê vî rastiyê rind fêma bike ku, êdî bi operasyonên faşîstî, bi kuştin û qirkirinê, talankirin û xerakirinê agirê Kurd û Kurdistanê venamîre, têkoşîn û şoreşa Kurd nasekine û bêencam namîne. Êdî yek rê û slogana gelê Kurd heye: "An azadî, an mirin". Divê ev rastî tu carî neyê jîbîrkirin. A duduyan jî ev e ku, êdî li hember Mehmetçîkan jî, Memocik û Şemocik hene.

Gureş Paşa weke dikê Hindiyân baskên xwe li hev dixwe û dibêje: "Mehmetçîkek here, hezar Mehmetçîk dikevin şûna wî". Rast e; ew ên ku dikevin şûna kuştîyan jî zarokên xelkê ne, çî ji Gureş Paşa re ye! Gedê Paşê jî wê rojê di televizyonê de digot: "Bi kuştina 30-40 çekdarên, ordiya Tirk naqede. Divê eşqîya bi vî rastiyê bizanibin".

Ez jî ji Erdalê delalî re vî rastiyê dibêjim ku, gerîla jî bi kuştinê naqedin. Dema ji wan jî tene kuştin cihên wan vala namînin. Yanî li hember Mehmetçîkên wan, êdî Ahmetçîkên wan jî hene. Herdu teref jî bi kuştinê naqedin. Yek ji çekdarên gerîla li hember hezar leşkerî şer dike; roj bi roj bi hêztir û zêdetir dibin. 20-30 milyon Kurd hene. Bi hêsaniyê ji wan milyonek gerîla dertê. Em wilo ferz bikin ku, ger Mehmetçîkên Gureş û Gedê Paşê, her roj 20-30 gerîla bikujin û vî rewşê û tempoyê, bi balefir, top û qobrayên xwe bidomînin jî, di sed-du sed salî de jî nikarin milyonek gerîla biqedînin. Erdalê gêjik bi çî eql û hişî dibêje "Emê di nêzîk de qira wan bînin". Evqas bêhişî û bêmentiqî nabe. Şîreta min li van hov û nemirovan ew e ku, bi vî awayî tu tişt naçe serî, tu girêk nayêne bişkivandin. Kara gelê Kurd û Tirk di heqnasî û demokrasîyê de ye.

Mirovahî ji nû ve li Kurdistanê şîn dibe

Salar Amedî

Ji tîkçûyîna împaratoriya Medan heya niha 2500 sal e ku em ti û birçiyê serxwebûn û azadiyê ne. Jar, reben û bindestên dagirker û çavikên nava xwe ne. Her çiqas di dîrokê de gelê Kurd gelek caran serî hildabe, hin caran bi ser ketibe û dewlet ji ava kiribe, ji ber gelek sebeban temenê van serhildan û dewletan kin bûye û bi qirkirinên mezin tîk çûne.

Di dîroka Kurdistanê de bi qasî ku dijminên gelê Kurd bi civaka Kurd leyîstine, dijminê tu gelan bi vî rengî bi wan neleyîstine. Dijmin sînorên ku di Kurdistanê de çêkirine, ew sînor di mejiyên gelê Kurd de jî çêkiribûn. Em ew çend ji hevûdu dûr ketibûn ku, me bi awirên tûj li hevûdu dinihêrt, bi pozek bilind nêzikî hevûdu dibûn. Awirên me tûj, axaftinên me tûj, diranên me tûj û simbêlên me tûj bûn, ji hevûdu re. Em ji siya xwe aciz dibûn, diçûn malê me kela xwe di serê jinên xwe de sar dikir. Jinan jî, tu çare ji wan re nemabû, tola xwe bi fitnebazî ji mêran distandin.

Kesekî nikaribû ji me re bigota serê rêça te xwar e, em har dibûn, li ser vî mîr dihatine kuştin. Lê dema em çav bi dijmin diketin, weke em çav bi çinan bikevin, tu zirav û mêranî bi me re nedidida û çêra bi me dikir. Lê pîrr baş bû, rojekê ji min re got "Aferîn." Tevî her zilm û zordariya dijmin me digot; "Xwedê dewletê ji serê me kême neke." Dema yekî welatparêz ji me re bigota, "Tu Kurd î," me digot, "Tu û bavê xwe Kurd bin lawo çima ez." Yanê dijmin ew çend civaka Kurd ji rastiya wî dûr

ma. Wê demê simbêltûjîti jî êdî pere nedikir.

Malbatên me, em bi dahol û zirne dişandine leşkeriya dijmin. Me diçû du sal ji dijmin re leşkerî dikir, me tîra xwe lédana xwe û çêrên xwe dixwar û em dihatin heya dawiya jiyana xwe me qala leşkeriya dijmin, dikir û me digot, "Dema ez esker bûm çawîşek me hebû gelekî li me


Mirovahî ji nû ve li Kurdistanê şîn dibe, PKK'ê betona dijmin bi xwînê qelaşt û civaka Kurd mîna gulek, mîna şaxeke darê fêkî ji nava wê betonê derxist. Ew şax îro bûye dar û ew dar jî dîsa her roj bi xwînê tê avdan. Lê mizgîn ji we re, va ye kulîlk vebûn, nêzîke ku em fêkiyê dara serxwebûn û azadiyê bixwin.

didida û çêra bi me dikir. Lê pîrr baş bû, rojekê ji min re got "Aferîn." Tevî her zilm û zordariya dijmin me digot; "Xwedê dewletê ji serê me kême neke." Dema yekî welatparêz ji me re bigota, "Tu Kurd î," me digot, "Tu û bavê xwe Kurd bin lawo çima ez." Yanê dijmin ew çend civaka Kurd ji rastiya wî dûr

xistibû ku, şeklê tu tiştî nedida mirovê Kurd û civaka Kurd. Me nizanibû ka em çî ne. Di nav gelên gerdûnê de timî serê me pêl bû. Dijmin bi vî jî qîma xwe neanî, em li çardorên gerdûnê belakirin. Digot min Kurd kirin bin axê û ser wan beton kir, nema êdî serî bilind dikin. Lê di hay û gumana wî de PKK nîn bû. Dema pê hesiya jî, hesabê PKK'ê baş nekir. Îro jî hê baş têngihîştîye ka PKK çî ye? Ji ber vê, hê jî hesabê PKK'ê îro jî nikare baş bike û bi çavsorî û harbûnek mezin qirkirinên xwe roj bi roj zêdetir dike. Em baş dizanin ku, dema sewalek birîndar dibe, har dibe û çî dikeve ber pençeyên wî (wê) dipertîne. Lê dawî xwînê wînda dike, dipirpîte û dimire.

PKK'ê di demek kin de, lê bi berdêlek giran, civaka Kurd ji xewa mirinê şiyar kir. Erê berdêl giran bû û wê hîn jî girantir be, lê tiştê ku em jî dixwazin tiştêk biçûk nîn e, Kurdistanê rengîn e û di jiyana de tiştê herî bi rûmet, serxwebûn azadî ye.

Gelê Kurd îro li kesayetiya xwe xwedî dertê. Hesabên dijmin ên der û malê hevûdu negirt. Kurd îro ji Awustralya heya Kanada, li çardorê gerdûnê serhildanan li dar dixin. Bi vê tîkoşîn û berxwedana xwe ya li hember zilm û zordariyê, îro gelê Kurd di gerdûnê de gelê herî serbilind



Mirovahî, bi girîn, bi qêrîn û halan, bi kuştin, qirkirin û talan, bi çirandîna rûpelên dîrokê yên bi qirêj û gemar û veguherîna siûda reş; di welatekî parvekirî û çeperkirî de û li ser axek ku bi tovên şoreşê li ber zayînê ye, ji nû ve şîn dibe. Ev şoreş hêviya serhildana mirovahiyê ye.

e. Mirovahî ji nû ve li Kurdistanê şîn dibe, PKK'ê betona dijmin bi xwînê qelaşt û civaka Kurd mîna gulek, mîna şaxeke darê fêkî ji nava wê betonê derxist. Ew şax îro

bûye dar û ew dar jî dîsa her roj bi xwînê tê avdan. Lê mizgîn ji we re, va ye kulîlk vebûn, nêzîk e ku em fêkiyê dara serxwebûn û azadiyê bixwin.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Yek ji romannivîsên Tirk ê herî bi nav û deng e. Romanên wî bi giştî, bi motivên civaka Kurd xemilandî ne. Gelek ji romanên wî hatine wergerandin zaravayê Soranî jî. Pirtûka wî ya herî navdar *İnce Memed* e. Di wêne de tî dîtin 2-*El Çekû* 3-Jana birînê/ Dengvedan, belavbûna deng 4-Kinnivîsîna 'doktor'/ Nêbatek, xaşil/ Di alfabeya Kurdî de xwendina tîpa sêyemîn 5-Malbat/ Paytexta Siûdî Erebîstan 6-Pîvan/ 7-Cînavka kesane ya yekemîn a yekehejmar/ Bawerî 8-Qanûn/ Notayek 9-Birêvebirin 10-Temsilkar/ Notayek

Serejêr: 1-Xwedê/ Fikir 2-Yek ji qewmên herî kevin ê Mezopotamyayê/ Ji Yewnana qedîm navê îlaheyekî 3-Jîpez û dewaran tî dotin/ Navekî mêran 4-Moral/ Beşek ji nava xanî 5-Hezaz, herikîna ax û kevir ji çiya/ Pereyê hin welatên Ereb 6-Kinnivîsîna Cumhuriyeta Tirkîyê/ Nexweşîneke hespan 7-Cînavka kesane ya yekemîn a pirrehejmar/ Serfirazî 8-Notayek/ Meydana gulaşa gayan 9-Ekonomî 10-Bêzar 11-Navê prensên Hindiyîyan 12-Muqawele

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												■
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ

Çeperast: 1-Dostoyevskî 2-Adar/ Ar/ Ûr 3-Nezan/ Zerîle 4-Ûleîma/ Evor 5-Şemî/ Anatomî 6-Îsa/ În 7-Netewe 8-Ekraz 9-Stad/ Arî 10-Sar/ Îran
Serejêr: 1-Danişîn/ SS 2-Ode/ Es/ ETA 3-Sazûmankar 4-Tralî/ Erd 5-Ne/ Îta 6-Ya/ Manedar 7-Erzan/ Ra 8-Aferîn 9-Sûret 10-Krîvo 11-Lom 12-Kerî

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkîyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyêke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Kadırga Liman cad. No.92

Eminönü 34490 İstanbul Tel: 518 25 28

Fax: 518 85 54

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Bawer neke derew e!

Dibêjin em bira ne
Ji bav û dêkê mane
Timî em bi hev re ne
Bawer neke Yalan e!

Dibên mafê însana
Gelek sal û zemana
Me daye tiştê hana
Bawer neke ji wana

Bawer neke derew e!
Hişyarî nîn e, xew e
Dibêje mast min da te
Nexape! ava dew e.

Di dinyayê carekî
Divê tu bawer nekî
Tiştê kû ew dibêjin
Lazim e qebûl nekî.

Bi dev pirr misilman in
Bi dilên xwe "şeytan in"
Tiştê ku ew dibêjin
Derew, hilê pîlan in.

Bi cûbbe û bi rûdan
Bi soz û ehîd û peyman
Wekî bavan û kalên
Xapandine gelek can.

Min zanibû gur tu car
Nabe roviyê hîlekar
Pê hesiyam, ez şaş mam
Gur, rovi ye, hem jî mar.

Di zemanî boriye.
Wan pirr gel xapandiye
Ji xeynî me her millet
Bi hilê wan zaniye.

Herkes bi wan zû zanî
Li pêşiya wan danî
Tenê emê razayî
Hilê wan me nezani.

Kes em şiyar nekirin
Ji xewê em ranekirin
Wan axa, şêx û melan
Wezifên xwe nekirin.

Gotin, heryek ji wana;
Wan xayin û dizana
"Halê me bi xwe xweş e
Me çi ye ji halê wana."

"Eger ew ji xew rabin
Dinyadît û zana bin
Bi her tiştê bihesin
Li hember me dê rabin."

"Emê bi piya herin
Gel bêjin rabin derên
Ji memleketê han,
Hûn dizê ga û keran."

Başê wan şiyar nekin
Wan xewaran ranekin
Rojek bo me rojek e
Însanê ku xayin be
Tim karê xwe dibîne.

Ew jî wek wanê hanî
Van faşîstên Tûranî
Me karê xwe difikirî
Ne karê tu insanî

Mele Bêwar

Mişt, Nîvco û Paqijo

Rojek rovi diçe ba gur û hirçê. Ji wan re dibêje: "Werin em tevî hev qeliyê çêbikin. Ji bo em zivistanê bixwin." Gur û hirç fikra rovi baş dibînin û qebûl dikin. Radibin ji bo zivistanê qeliyê çêdikin. Qeliya xwe dikine dene û devê wî têr asê dikin. Qeliya xwe jî dikine şikeftekê.

Di ser de gelek wext derbas dibe. Dilê rovi dibije qeliyê. Di cihê xwe de natebite, piyên rovi nayên binê wî. Dibe niçe niça wî. Rewşa rovi bala hevalên wî dikişîne. Jê dipirsin: "Birakê rovi tu çima bêmade yî? Mirûzê te kiriye, Xwedê xêr bike?" Rovi: "Lo heyra qet mepirsin. Mala paşê şandine pey min. Bûka wan a mezin razaye. Kurek aniye. Dixwazin ez navekî lê deynim. Heyra ji min pê ve kesek nemaye ku nav li kurê wan deyne?" Hevalên wî: "De madem şandine dî te, tu jî here. Navekî bike, belim (belkî) te perû jî bikin."

Roviyê me qaşo dihere mala paşê. Lê xwe ji hevalên xwe vedîşere û dikeve diziya qeliyê. Kûpê qeliyê mişt dike. Difetile tê ba hevalên xwe. Heval jê dipirsin: "Birako te çi navî lê danî?" Rovi: "Pitikekî wisa xweşik bû min jî rabû navê Miştê lê danî. Tevan jî ev nav eciband." He-

valên wî: "Nav li dinê be, te çi navekî xweş lê kiriye."

Çendek di nav re dibore. Dîsa dilê rovi qelî dixwaze. Radibe çindikek dide vî serî, yekî dide wî serî. Çav pê dikevin jê dipirsin: "Xêr e, çi hewalê te ye?" Rovi: "Heyra ezê serê xwe hilînim herim ji vî welatî. Mala paşê tu rihe tiyê nadin min. Vê carê jî bûka wan a navîn ketiye nava nivînan. Kurek aniye. Dîsa dixwazin ez nav lê deynim." Gur: "De qey ji te kêfxweş in. Te navek li kurê wan danî li xweşî wan çû. Lewma gazî te dikin. Tu çima naçî mala-va."

Roviyê me dikeve rê. Xwedêgiravhi bi hinceta ku diçe mala paşê. Xwe ji hevalên xwe vedidize. Qasek bi şûn ve li dûşa xwe difetile. Diçe dikeve ser deneyê qeliyê. Qelî dibe nivî. Dema tê warê xwe li ser serê wî dihêwirin. Hirç: "Ka bibêje vê carê te çi navî li neviyê paşê danî." Rovi: "Yekî gindirî bû, nelihev bû. Min jî navê Nîvco lê xweş dît. Ji min kirî kurik jixwe nîvcoyî bû." Hevalên wî: "Yawo tu van navên entî-ke ji ku tîni? Mirov dibêje qey Xwedê te ji bo navan daye." Rovi: "De ez jî, hema ji xwe re li wan dinêrim û li gorî wan nav li wan datînim."



Demeke dirêj di ser de derbas dibe. Rovi ji qeliyê tamijiye. Vite vit ketiyê. Nizane tebatî çi ye. Of û pifa wî ye. Misêwa ji xwe re diçe û tê. Çav bi vê rewşa wî ya nepak dikevin. Xwe ranagirin jê dipirsin: "Birayê rovi xêr e, ax max dikişinî, çi bi te bûye?" Rovi: "Dîsa mala paşê şandine pey min. Bûka wan a biçûk razaye. Kurek jî, ji wê re bûye. Dibêjin bila were navekî li wî jî deyne. Ez êdî pirr qariyame. Gelo di vî welatî de kes nemaye? Ezê ji xwe re şarederî bibim. Biheyîbim herim ku kes min nebîne." Gur: "Malava, te du navên wisa delal li wan danî, hema here li wî jî deyne. Wê çi bibe, malneket." Rovi: "De madem hûn rezayê wiha lê dibînin. Ezê jî herim navek li wî jî deynim. Ez çawa bikim. Bila wekî we be."

Roviyê fênek dîsa xwe ji hevalên xwe çeng dike, diçe dikeve ser qeliyê. Qeliya mayî jî dixwe, diqedîne. Heta binê dene jî dialêse. Qederê xwe diwîqîne. Pişt re tê cem halên xwe. Jê dipirsin: "Birako te çi kir? Ca were ji me re bibêje." Rovi: "Ez çi serê we biêşînim. Ezê kin û kurt bibêjim. Pitikek lihevhatî û pak bû. Min jî navê Pakijo lê danî û ez hatim." Hirç: "Tu lê, çi navine xweş li pitikan datîne. Helal be ji te re."

Kes bi kirinê rovi nahese. Zivistan bi ser van ve tê. Çilê Erebe. Berf ketiye erdê. Mij û moran e. Kes nikare nêçîrê jî bike. Rewirek jî li çolê namîne. Her kes dikeve kun û qulên xwe. Gur, rovi û hirç birçî dibin Qeliya wan tê bîra wan. Ji hev re dibêjin: "Ana me qelî ji bo çi kir? Ji bo rojê wiha ne? Ka werin em qeliyê bixwin."

Diçin ku kûpê qeliyê bînin, dêna xwe didinê malê tu xe-

ra bibî. Dene vip vala ye. Li hev dinêrin. Di cihê xwe de matmayî dimînin. Ji hev re dibêjin: "Diz ji me pê ve tu kes nîn e. Emê ji hev re sond bixwin." Rovi: "Hûn bi ya min bikin, heta em ji hev re sond bixwin, emê wiha bikin. Emê tev berê qûna xwe bidin ber tavê. A kê don da, diz ew e. Emê li hêviya derketina rojê bimînin."


Gotina rovi tê qebûlkirin. Li benda rojê dimînin. Çend rojê dikeve navê. Roj li esmanê bi ewr dibişire. Tev tèn ber şikeftê. Pişt xwe didinê û xwe li ser devkî dirêjî erdî dikin. Di xew de diçin. Roviye lepek bi dek û dolab e. Bi dizîka radibe û bi qûna hirçê de mîz dike. Pişt re diçe gur ji xew radike. Rovi: "Birakê gur rabe, rabe me dizê xwe qefalt. Dizê malê hirç e, hirç." Gur ji hindav de radike, çavên xwe miz dide û ber bi hirçê ve diçe. Bala xwe didê ku qûna hirçê şil e. Hirçê ji xew şiyar dikin. Dibêjin: "De rabe, dize diz. Tu şerm û fedî nakî. Tu li xwe jî danaynî ku tu ketiyê qeliyê. Va qûna te don daye. Diz tu yî. Cezayê te kuştin e. Emê te bikujin û di şûna qeliyê de te bixwin." Hirç: "Eman, yeman çawa dibe. Welle min qeliyê nexwariye, ev bêbextî ye hûn bi min dikin." Dibe qare wara hirçê, diqilqile. Diperpîte, dike nake xwe ji lepên gur û rovi nafilitîne.

Gur û rovi, hirçê dikujin û dikevin ser kelaxê wê. Bi beratê wê zikê xwe têr dikin, dişidînin. Roviye hîlebaz piştî bi demekê bi xap gur jî, ji navê hiltîne.

Çiroka me çû diyaran, rehme li dê û bavê hazir û guhdaran, xeynî şeytanê korê ber diwaran.

Berhevkar: Zana Farqînî

Ka werin niqteyan bigihînin hev, ka wê çi derkeve!



Zerdeştê hemdem Xalê Mihemed

Ez timî car dibêjim Kurdistan xezîna çand û toreyê ye, bêguman heta niha serdestan di bin bandora xwe de rohnî û tîrêja vê xezîneyê nîşanî gelê me ye bîndest nedaye. Dema em li Kurdistanê digerin bi dewlemendiyê mezin rewşên çandî, zanistî, wêjeyî û hwd. derdikevin pêşya me. Li Serhedê ev rastî, xwe dide diyarkirin, her wekî me nav û dengê Xalê Mihemed bihîstibû di nava gel de bi navê "Gawir Lenîn" tê naskirin. Ji bo hevpeyvînekê me destûr jê stand û em çûne gundê wî. Navê gund Axedeve ye, cihekî pîrr xweş û delal e, bihuştek ji sirûştê (xweza) ye ev der. Ez û nûçevanên (mûxabîrên) Özgür Gündemê em çûne gund, li ber derê Xalê Mihemed sekinîn. Xalê Mihemed bi rûmetiyê mezin bi me re hilket û tîkiliyê ke xweşik nîşanî me da. Lê ez dikarim vê tespîta hanê jî bikim: Gelê Kurd der heqê mêvan û tîkiliya bi rewşên bîran re pîrr qencîkar û dilsoz in, ev rewş xwe di malbata Xalê Mihemed de, da beyankirin. Ji me re gotibûn ku Xalê Mihemed mirovekî bêol e, li hember hemû ol û toreyên gel derdikeve, em çûn me pê re hevpeyvîn çêkir û bi hev re axivîn, me dît ku ne wek gotina wan kesan e. Xalê Mihemed mirovekî pîrr bi rûmet û zana ye, di dilê wî de hezkirin û parastina gel û însanan heye. Lê di nav gel de pesnê wî jî tîndayîn, gel dibêje: Xalê Mihemed xêncî dibistana pêşîn dibistan nexwendine, lê wek profesorekî zanebûnên wî henin. Pîrr pirtûk standine û rojname û kovarên felsefî, psikolojî, edebî û hwd. dixwîne. Ka çawa dibe ku mirov dibistanê nexwîne, lê ji ewqas pirtûk û berhemên felsefî û zanistî fêm bike? "Dîsa gel dibêje: "Xalê Mihemed ji mirin û rabûnê qal dike, ew dibêje ku rih (cewher) tu car namire û tim û car ji qalib (laş-cendek) derdikeve û dikeve qalibekî dinê. Însan ji bo mirinê ne heyinek e, ji bo her tim hebûnê heye, ev rastî di jiyana zîruhan (benderuh) de amade ye. Em ango însan tecrube û ajalan derbas dikin û paşê derbasî demajoya însanan dibin. Însan dimire lê dendikê wî namire, ew dendik bi milyaran sal e heye û demajoyan wî celeb bi celeb in û hwd."

Li ser van gotinan me bala xwe kişande ser hunerên Xalê Mihemed û me pê re tîkiliya xwe xurttir kir. Felsefa Xalê Mihemed ji ya pêxemberê Kurdan Zerdeştê, raman û dîtinên

Xalê Mihemed bi giştî ji ber gotinên Zerdeşt hatine hildan, lê Xalê Mihemed gotinên xwe ji yên Zerdeşt zêdetir dike û di bin bandora zanistiya hemdem de dide dewlemendkirin. Em dizanin ku felsefa Zerdeşt û ramanên wî li ser gelê Kurd pîrr bandoreke giran kiriye, ji ber wê di nav gelê Kurd de hinekên wek Xalê Mihemed yên tim û car derkevîne holê ev ne tiştekî xerîb e. Lê Xalê Mihemed di aliyekî din de jî, ji bo gelê me mînakê girîng e. Lew Xalê Mihemed nexwendî ye, lê nirxê mezin daye pirtûk û xwendinê. Îro gundê Kurdistanê di vê mijarê de pîrr bêçare û qels mane. Di van gundê han ên bêçand de yekî wek Xalê Mihemed nexwendî ku wiha nirxê bide xwendinê û pirtûkan, pîrr kêman.

Xalê Mihemed Ji kerema xwe, ji me re der heqê jiyana xwe de çand gotinan bike.

- Kurê min, ez îro pêncî û pênc-şêst salî me, jiyana min giş di xizaniyê de çêbas bû. Dema ez biçûk bûm min ji xwendinê pîrr hez dikir, lê di gund de dibistan tune bû. Paşê dibistan hate çêkirin. Pêşî ez çûm. Ez der heqê zanebûna matematîkê de pîrr serwest bûm, lê Tirkiya min qels bû. Dema min dibistana pêşîn xelas kir, bavê min ez neşandime dibistanên din û ez nezan mam. Lê di mejiyên min de hinek tiştên girîng derbas dibûn, lew min ji van tiştan re tu bersiv nedidit. Bavê min Qur'an bi min da xwendinê, lê ez mirovên dinyayeke din bûm. Ez di sala şêstan de çûme eskeriyê, li wir li ba edebiyatvanekî der



Xalê Mihemed mirovekî pîrr bi rûmet û zana ye, di dilê wî de hezkirin û parastina gel û însanan heye.

xwe ramanekê derxiste holê.

Xalê Mihemed tu dikarî der heqê felsefeya xwe de hinek gotinan ji me re bibêji?

- Felsefeya min pîrr giran e. Tu kes wisa bi hêsanî nikare xwe bigihîne vê felsefeyê, lew ji bo wê pêwîst e ku mirov evolvîsyonê (guhertîne) girîng derbas kiribe. Made her car heye, tu car winda nabe lê wisa jî tê guhertin û dewr û daîmkirin. Însan ji kurdî, ji dirixteke sade (basit) ta niha şêl û lewn (bîçim) guhertîye û heta însan hatiye, însan jî lewnê diguherîne ber bi Xwedîtîyê diçe. Elametên Xwedîtîyê xwe naskirin e, xwenaskirin jî ji-

xwestina jiyane tê, jiyana bi mirinê ve tê holê. Cewhera însan made ye, ne made hîn e, ev cewher tecrube ya însanan a milyon salan di xwe de vedîşere, bi her mirinê re ev cewher di hundirê rehîma dê de di hundirê zîgotê de ji xwe re qalibekî çêdike û dîsa tê dinyayê. Lê dema ew cewhera ku hate dinyayê xwe bir nayne û nezan dimîne ji bo vê bûyerê pêwîst e ku, mirov bixwîne xwe û wan jiyane xwe yên berê bi bir bîne.

Tu der heqê axa û began de, der heqê rizgarî û serfirazî ya gelên bîndest de çi dikarî ji me re bibêji?

Îro jî hezarî zêdetir pirtûk li cem min henin, ji însanan re xwendin rîyek e, lê ne rîyêke herî mezin e, xwendina herî mezin guherîna însana ne û ev bûyer tecrube ya herî mezin e. Her tişt bi vî rewşê wate digire.

- Lawo axatî û begîtî qesase serê vê civaka bîndest e, ev kes bi hinek meleyên rengmele ve civakê bi ol û ramanên xwe yên bêrast ve dixapînin. Hember zilmê şer pêwîst e, celeb bi celeb şer hene û pêwîst e ku ev rê giş bîndest ceribandî. Şerê ku îro

li Kurdistanê didome di bin destê proleterya de didome û bi hêzên şoreşgerî ve tê qedandin. Ji ber wê ev fersend ji bo Kurdan û gelên Rojhilata Navîn elzem û girîng e.

Xwendina pirtûkan çima girîng e?

- Kurê min însan bi serî û bîni bilind e, bilindî jî elimandin û fêmkirin e. Xwendin her tişt e, lê car jî tu tişt nîn e. Lew bi xwendinê ve mirov rîya zanebûnê hîn dibe. Lê ji sirûştê, ji cihanê eqseke giran hilnade, lew mirov eger ku guherîneke kûr û dûr derbas nekiribe mirov çiqas bixwîne bandora wî dê qels bimîne. Ne ku ez bawerî bi xwendina pirtûkan nakim, îro ji hezarî zêdetir pirtûk li cem min henin, ji însanan re xwendin rîyek e, lê ne rîyêke herî mezin e, xwendina herî mezin guherîna însana ne û ev bûyer tecrube ya herî mezin e. Her tişt bi vî rewşê wate digire.

Xalê Mihemed daxwaziya te ji însanan çi ye?

- Ez dixwazim însan bi du tiştî rind bigirin. Yek mafê însanan e, ya din xwenaskirin e. Însanê xwenaskirî erdem e û Xwedê ye, însanê mafparêz jî ronakbîr e û şoreşger e. Ev herdu xûy-û xislet bingehek ji rewşa însanan a guherîne ye. Lê pêwîst e ku, însan car jî bi tenê bimîne û tîkêve kûraniya mejiyên xwe û jiyana xwe ya dirixtî û ajali bibîne û ji nezaniya vê heynê derê.

**Hevpeyvîn:
M. Zahîr Kayan**



heqê felsefeyê de gelek tişt hîn bûm. Wan ji min re digot, "Te nexwendîye tu nikarî felsefeyê bixwîni, tu dê hişê xwe wîndabiki." Lê min guh neda wan û ez ketim pey felsefê û xwendina wê û min ew di demeke kin de xweş qedand û min paşê li gorî

yana xwe ya milyon salî berê, bîranîn e. Însan tu car namire, ew her car heye û yê tim û car jî hebe. Mirin ji bo însan rabûne, guhertin e, demajoyeke nû ye ber bi Xwedê rêveçûyîneke girîng e. Lew însan bi mirinê ve rîya Xwedîtîyê kifş dike. Mirin ji

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.